

Bi hêviya serkeftinê Newroza we pîroz be!

Îsal Newrozê zû dest pê kir. Li gorî agahiyên ku bi dest ketine gelê kurd li Amed, Mêrsîn û Wanê roja 18'ê adarê dest bi pîrozkirina Newrozê kiriye. Li Amedê li taxan û dersxaneyan gel agirê Newrozê geş kir. Li Amedê 800 xwendekarên dersxaneyan, li Wanê bezar xwendekarên Zanîngeha 100. Yilê û li Mêrsînê jî 200 xwendekarên Zanîngeha Mersînê agirê Newrozê vêxist û bi sloganên xwe Newroz silav kir. Di çalakiya Wanê de 150, di ya Mêrsînê de jî 100 xwendekar hatin binçavkirin.

WELAT

Azadiya

Rojnameya Hefteyî

164

20-26 adar (14ar) 1999

BUHA (Fiat) : 250.000 TL

ISSN 1301 7497

64

9 771 301 749 707

DIGEL ÇALAKIYÊN TOLHILDANÊ JÎ KOMPLO DIDOME



Hedef saziyên kurd in


✓ 17 ciwanê kurd hatin kuştin

Pişî ku li metropolan çalakiyên tolhidanê pêk hatin, dewletê jî hewldanên xwe yên ji bo astengkirina xebatên saziyên kurdan zêde kirin. Çalakiyeke ku ji hêla Tîmên Tolhidanê yên Kurdên Neteweperest ve pêk hat reaksiyona saziyên tirkan ên sivil û çepgir kişand, lê tevkujiya ku roja 11'ê adarê li Sasonê bi kuştina 17 ciwanên kurd ên sivil encam da, bala kesî nekişand.

✓ Tûrîzma tirk derbe xwar

Dewleta tirk dixwaze van çalakiyên li dijî sivilan ji bo astengkirina xebatên saziyên legal bi kar bîne. Li aliyê din bandora van çalakiyan û daxuyaniya ARGK'ê ya ji bo tûristan di cih de encam da û gelek dewletan ji hemwelatîyên xwe xwest ku ew neçin Tirkiyeyê. Her wiha vê daxuyaniyê di çapemeniya cihanê de jî gelekî deng veda. (Nûçe:R.3)

Azadiya WELAT



E-Mail: s.berbang.usa.net

SAMI TAN

Ji bo ku ji vê komployê rizgar bibi, divê jî kurd li hemberî stratejiya neyaran, stratejiyeke neteweyî pêk bînin û bi taktîkên rojane û bi hostefî têbikoşin.

Li hemberî jenosîdê stratejiyeke neteweyî

Li dijî gelê kurd dek û dolabên dijwar têne gerandin. Komployeke navneteweyî li dar e. Ev komplo, bi dîlgirtina Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan bi dawî nebû. Hedefa komployê bi têkbirina PKK'ê nehatiye bisînorkirin, hedefê şkêndandina doza gelê kurd e.

Niha hedefa wan a nû, saziyên kurd in. Bi hewlên dewleta tirk ên hefteya çûyî derket holê ku dewlet dixwaze her tiştê têkildarî kurdan ji ser rûyê cihanê rake. Ji bo dewleta tirk hedefên sereke diguherin, lê bi awayekî giştî hemû kurd û tiştên têkildarî kurdan hedef in. Duh Öcalan hedef bû, îro MED-TV, sibê dibe ku partiyek an jî saziyeke din a kurdan bi hedef. Heke kurd naxwazin, bibin firavîn, şiv an jî paşiva dewleta tirk û hevalbendên wê, divê bi vî çavî li meseleyê binihêrin.

Ev yek ji mêj ve dihate zanîn, lê îro ew helwesta dewleta tirk û hevalbendên wê zelaltir bûye. Piştî dîlgirtina Öcalan hinek kesan got, 'belkî piştî vê yekê çareyek ji Kêşeya Kurd re bê dîtin.' Heta di çapemeniya biyanî, nemaze ya

amerîkî de gotinên bi van dîtinan dagirtî hatin weşandin, di van gotaran de dihate xwestin ku "dadgeha ku Öcalan lê tê darizandin" bibe plaforma nîqaşkirina Kêşeya Kurd û çareseriyeke siyasî ji Kêşeya Kurd re bê peyda kirin. Di wan nivîsan de ji tevgera kurd jî dihate xwestin ku helwesteke erênî nîşan bide.

Lê helwesta rayedarên tirk tiştêkî din digot, hê jî heman tiştî dibêje. Wêneyên Öcalan ên li ber ala tirk û bi çavên girêdayî di televîzyonê û rojnameyan de bi rojan hatin weşandin. Kesên ku qala çareseriyê dikirin jî, gotinên Öcalan ên bi rengê "heke ji bo berjewendiyên gelên tirk û kurd tiştêk bikeve ser milê min, ez amade me" bi mebesta biçûkxistina wî bi kar anîn û bi vê yekê ji bo çalakîyên tundra kela dilê kurdan rakirin.

Piştî ku çend çalakî pêk hatin, îcar jî dest bi qaj û wajê kirine. Kesên ku bi salan e li Kurdistanê her cure çalakîyên nemirovane li ser gelê kurd pêk tînin û her roj mirovên sivil dikujin û gundan dişewitînin, çalakîyên ciwanên kurd ên tolhildanê wekî hovîtî bi nav dikin.

Gelê kurd divê gelekî hişyar be, rayedarên dewleta tirk hemû hêza xwe li ser tunekirina kurdariyê civandiye. Hemû sazî û kes ji bo pêkanîna wê daxwazê hatine birêxistin kirin. Stratejî yek e, lê taktîk rojane diguherin.

Dema mirov bala xwe dide çapemeniya tirk, taktîkên dewletê yên rojane têne dîtin. Li Göztepeyê mirov têne kuştin, çapemenî êrîşî dewletên ewrûpî dike, da ku çavdêran neşînin dadgeha Öcalan. Di vê helwestê de dilovanî û dilsojî nîn e, giriyê wan jî kenê wan jî ne jidil e û bi temamî taktîkî ye. Her kes dizane ku li Tirkiyeyê tiştê herî erzan canê mirovan e, her roj di qezayên trafikê de bi dehan mirov dimirin, lê bin guhê kesî xwî nade.

Divê kurd jî bi zanîtiyê û hostefî tevbigerin. Li hemberî stratejiya neyaran, stratejiyeke neteweyî pêk bînin û bi taktîkên rojane û bi hostefî têbikoşin. Pêwîst e hemû kes û sazî bikevin xizmeta vê stratejiyê, da ku ew karibin ji jenosîdê rizgar bibin.

Kurd volkanên ber teqînê ne

Ferhengok

ajdan: bişkivîn, zîldan	kordunda: mêrê bêzarok
alozi: kaos, nexweşî	kuliçe: kurabiye
balafirşkên: uçak-savar	kultî: siyer, cihê nivînan
belefire: virik, amel	lewate: homoseksûel
berjewendî: çikar	ligel: pê re, tevî
beşdarbûn: katilmak	mêjû: dîrok, tarîx
bizbîlîq: sip spî (karbeyazî)	nakokî: çelişki
cejn: roşan, îd	netewe: millet
çitbûn: saplanma	newrozîn: bahar çiçeği
cuda: farklı, ayrı	parêzer: savcı
dadger: hakim	saffîkirin: çareser kirin
destûrname: tüzük; anayasa	sazkirin: organize kirin
dijayetî: karşılık	serdeste: çavîş
dilsoz: sadık, bağlı	serheng: albay
direfş: sancak	serjinik: kılıbık
endam: üye	serpel: yüzbaşı
firkandin: ovuşturmak	serperî: deniz kızı
gobîlîn: esinti, esmek	tej: birên zeviyê
henderan: diyaspora, xerîbî	vekarîn: kayîn (geviş)
hilreşandin: havaya atarak dağıtmak	xilt: köstebek
hincet: bahane	ziryan: poyraz
kelejin: jina wekî mêran	

CAN DILBIRÎN

Bi komploya navneteweyî ya ku li dijî Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan hate lidarxistin re, kurdistanî û dostên wan ên li Ewrûpayê ketin nava liv û lebatê. Kurdistanîyan xwestin raya giştî ya Ewrûpayê bi çalakîyên xwe ji bûyer û tevkujiyên li Kurdistanê agahdar bikin. Lê roja 16'yê reşemiyê komplo bi dilketina birêz Öcalan re bi dawî bû. Lê bi bihîstina nûçeya dilketina Öcalan re kolan û navendên bajarên Kurdistan, Tirkiye û çar aliyê cihanê bûn qada çalakîyên kurdistanîyan. Piştî ku televîzyon û çapemeniya şovenîst a dewleta tirk dest bi propagandaya şerê psîkolojîkî kir kîna kurdistanîyan li hemberî rejîma kedxwir zêdetir bû. Herkesên ku dimenên Öcalan di tv'yên tirkî de dîtin derketin kolan. Kurdistanîyan gelek şehîd dan, birîndar dan lê dev biryara xwe bernedan û dilsoziya xwe ya bo serokê xwe nîşan dan. Yek ji wan çalakîyan li ber avahiya Konseya Ewrûpayê li bajarê Strasbûrga Fransayê ji aliyê 67 hezar kurdistanîyan ve pêk hat.

Çalakîyan bi awayekî aştîyane devam dikin. Di roja çaran a çalakîyên kurdistanîyan û dostên wan de polisên fransî bi êrîşekê xwestin gel ji hev û din belav bike. Êrîşa ku bi bombeyên gazê û guleyên plastîk ji aliyê jendermeyan ve pêk hat, bû sedema birîndar-

bûna 11 kesan. Di nava birîndaran de, li gorî agahiyên ku me girtine, destê yekê ji ber bombeyên polîsan jêbûye. Du kesên ku tiliyên wan qut bûbûn min bi çavên serê xwe dîtin. Ev der welatekî ku di warê mafên mirovan de pêşketî ye. Mixabin rayedarên vî wela-tî li ser avahiyên bilind li polisên xwe dinêrin. Li gel kurdistanîyan Rêxistina BethNahrîn jî bi xurtî piştevaniya çalakîyê kir. Kurdekî birîndar ji endam û

Bi taybetî li Ewrûpayê kesên ku hetanî niha navê tevgera kurdan qebûl nedikirin, niha serkêşiya çalakîyan dikin, bûne sempafîzan, sempafîzanên berê bûne mîlîtan. Mîlîtanên berê her yek bûye volqanek û li ber teqînê ye.

nûnerên çapemeniyê re digot, "wan ez birîndar kirim, lê wan rehên min ên razayî jî ji xewê şiyar kirin, ez li dijî wan bûme marekî birîndar." Mirov dikare ji vî gotinê pir tiştan derfene eger Ewrûpa ji bo ewlekariya birêz Öcalan tevdirê negire. Îro li gorî daxuyaniyên fermî yên ewrûpiyan ji bilî wela-tên din bi tenê li Almaniyayê 11 hezar mîlîtanên PKK'ê hene.

Gelo teslîmgirtina birêz Öcalan bo çareseriyê firsend e yan na? Li gorî min ev firsenda ku ketiye destê ewrûpiyan û Tirkiyeyê divê baş bê nirxandin. Ji ber kesekî ku dê vî meseleyê çareser bike birêz Öcalan e. Eger dew-

let vî qebûl neke û li gorî sistema kemalîst wî bidarizîne wê çaxê dê xwezîya xwe pir bi dema Öcalan bîne. Di nava kurdan de her ku diçe radîkalîzma kurdariyê xurtir dibe. Eger ku yekî din were cihê Öcalan dibe ku şer gurtir bibe, bêtiyên xwîn birije. Lewre eger ku aqilmendên dewleta tirk vî yekê nenixînin ez bawer im di demeke pir kin de şerê navxweyî dê ji Bosna û gelek deverên din xerabtir bibe. Îro bi sedan malbatên ku zarokên wan di vî şerî de hatine kuştin hene, bi milyonan kurd li nav bajarên Tirkiyeyê dijîn. Kî dikare garantiyê bide ku her yek bo azadiya xwe bo serokê xwe nebe volkanek û neteqe.


Dema ku mirov li kurdistanîyên li Ewrûpayê dijîn dinêre ev yek zelaltir dibe. Kesên ku hetanî niha navê tevgera kurdan qebûl nedikirin, niha serkêşiya çalakîyan dikin, bûne sempafîzan, sempafîzanên berê bûne mîlîtan. Mîlîtanên berê her yek bûye volqanek û li ber teqînê ye.

Her cara ku di tv'yên tirkî de dimenên Öcalan derdikevin, bi sedan ciwan biryara çuyîna nav refên ARGK'ê didin. Ev li dijî bédengîya dinyayê bi taybetî ya Ewrûpayê bersiv e. Dibe ku lezê bidin xwe ji bo çareserîya Pirs-girêka Kurdan konferanseke navneteweyî pêk bînin.

Gelê Kurdistanê wekî pêlên Ferat û Dîjleyê bi kîna nîfrîn li hev dicivê û mîna volkana Çiyayê Agirî dikele. Dema ku biteqe dinyayê biheje.

DIGEL ÇALAKIYÊN TOLHILDANÊ JÎ KOMPLO DIDOME

Hedef saziyên kurd in



Gelek saziyên çepgir jî ev bûyer şermezar kir. Bo nimûne rêxistin û partiyan mîna EMEP, ÎP, İHD û DHKC'yê ev bûyer şermezar kir. Derdorên kurd digel negirtina berpirsiya bûyerê didin zanîn ku ev derdor dibin hacetê şerê qirêjî û çavên xwe ji tevkujiyên li Kurdistanê re digirin û bi tenê çalakiyên kurdan ên tolhildanê şermezar dikin. Ev gotin di pratîkê de jî hate çespendin. Kes û saziyên ku ev bûyer şermezar kirin, çavên xwe ji Tevkujiya Sasonê re girtin.

Hef-teya çûyî di nav rûpelên çapemeniya tirk û cihanê de bûyerên li metropolan û hişyarnameya ARGK'ê ya ji bo tûristan cih girt. Bûyera ku 13'ê adarê li Göztepeya Stenbolê pêk hat, bû sedema reaksiyonên cur bi cur, ji ber ku bûyer li hemberî mirovên sivil pêk hatibû, piraniya saziyên demokratîk ev bûyer şermezar kir. Lê çapemeniya tirk bi awayekî taktîkî nêzikî bûyerê bû. Ji ber çapemeniya tirk ev bûyer bû sedema êrîşên li ser saziyên demokratîk û saziyên ragihandinê yên kurd. Bo nimûne rojnameya Hürriyetê di manşeta xwe ya roja 14'ê adarê de berê xwe da saziyên mîna İHD'yê û ji dewletên Ewropayê jî xwest ku MED-TV û Özgür Politikayê bigirin.

Tevî ku "Tîmên Tolhildanê yên Nete-weperest ên Kurd" berpirsiya bûyera navborî girte ser milên xwe û PKK'ê jî diyar kir ku ew li dijî êrîşên li ser sivilan in, çapemeniya tirk bûyer xiste stûyê PKK'ê û hate xwestin ku Ewropa li Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan xwedî dernekeve.

Gelek saziyên çepgir jî ev bûyer şermezar kir û da zanîn ku bûyerên bi vî rengî xesarê didin têkoşîna gelan. Bo nimûne, partî û rêxistinên mîna EMEP, İP, İHD û DHKC'yê ev bûyer şermezar kir. Derdorên kurd digel negirtina berpirsiya bûyerê didin zanîn ku ev derdor dibin hacetê şerê qirêjî û çavên xwe ji tevkujiyên li Kurdistanê re digirin û bi tenê çalakiyên kurdan ên tolhildanê şermezar dikin.

■ Li Sasonê 17 ciwanên sivil hatin kuştin

Ev gotina rêxistinên kurd bi bûyerekê hate çespendin. Roja 11'ê adara 1999'an li gundê Heribê (Babiş) yê Sasona Batmanê 17 ciwanên kurd bi bombeyên napalmê hatin kuştin. Li gorî agahiyên ku bi dest ketine ev tevkujiyê bi destê ferdariya Qereqola Acarê, cerdevanê gundê Kanîkê Ahmet û noker İdris Çakır û Baki Karabaş pêk hatiye. Hate gotin ku armanca vê tevkujiyê kêmkirina beşdariya ciwanên kurd a bo nav refên ARGK'ê ye. Bi mebesta ku li jor hate ravekirin, İdris Çakırê ku li Foçayê leşkeriyê dike, ji a-



liyê fermandarê qereqolê ve bi destûr bo gundê wî tê gazîkirin. Çakır digel nokerê bi navê Baki Karabaş xwedêgiravî ji bo ARGK'ê zarokên kurd berhev kirine, ew birine gundê Tanzê, li wê derê gazî komikeke biçûk a gerilayan kirine, piştî hatina komika gerîla jî, 9 firokeyên kobra hatine bi bombeyên napalmê 17 ciwanên kurd kuştin. Malbatên ku çûne ser cendekan ji ber ku ew bi napalmê hatine şewitandin, cendekê zarokên xwe nas nekirine. Li gorî agahiyên ku bi dest me ketin, van her du nokeran berê jî li metropolan du ciwanên kurd bi vî rengî dane kuştin.

Vê tevkujiyê ji bilî Rojnameya Evrenselê di çapemeniya tirk de cih negirt û ji hêla tu saziyê ve nehate şermezarkirin. Rojnameya Evrenselê jî cihekî biçûk da bûyerê.

■ Saziyên kurd hedef têne nişandayin

Dewleta tirk û çapemeniya tirk van çalakiyan ji bo tengavkirina pêgeha tevgera kurd bi kar tînin, li aliyê din jî terora hêzên dewletê ya li ser kurdên metropolan zêde dibe. Di serî de HADEP, hemû saziyên legal ên kurdan wekî hedef têne girtin. Ji mirovên ku têne binçavkirin tê xwestin ku MED-TV û HADEP'ê wekî berpirsên bûyeran nişan bidin û bi îşkenceyê îfadeyên bi vî rengî ji wan têne girtin. Li ser vê yekê daxuyaniya komek welatparêz gihîşt ber destê me, wan welatparêzan daye zanîn ku bi darê zorê bi

awayekî çavgirtî polîsan îfadeyek bi wan daye şanavakirin, di vê îfadeyê ev tişt heye: "Min talîmata çalakiyê ji MED-TV'yê girt, MED-TV'yê ez fit kirim û min jî ev çalakî pêk anî."

Rayedarên dewleta tirk bi vê yekê jî namînin, gel han didin da ku ji rayedarên dewletên ewrûpî re bo girtina MED-TV'yê nameyan bişînin. Hin caran ev yek ji handanê derbas dibe û bi darê zorê ev yek têne pêkanîn. Li Fermandariya Tabûra Çungûşa Amedê, dewlet bi darê zorê bo girtina MED-TV'yê faksan bi leşkeran dide kişandin.

Daxuyaniyeye din a komek welatparêzên din jî gihîşt ber destê me, di vê daxuyaniyê de jî li ser kompoyên hêzên dewletê hatiye rawestandin. Li gorî vê daxuyaniyê polisên Stenbolê daristana li derdora Bendava Ömerliyê wekî cihê îşkencekirin û kuştina mirovan bi kar tînin. Welatparêzên kurd diyar dikin ku ew li vê deverê bi rojan di lêpirsinê de mane û digel îşkenceyên xedar, gefên kuştinê li wan hatine xwarin. Bi tenê MED-TV wekî hedef nayê nişandayin her wiha HADEP jî wekî hedef têne nişandayin. Ev yek jî ji hêla rayedarên dewletê ve têne kirin. Waliyê Stenbolê Erol Çakır bi awayekî vekirî HADEP'ê wekî berpirsê bûyerên ku li metropolan diqewimin nişan da û di civina çapemeniyê ya roja 16'ê adarê pêk hat de îdia kir ku hinek hêzên legal alîkariya çalakdaran dikin û bi awayekî sergirtî bal kişand ser HADEP'ê. Rayedarên HADEP'ê jî ew helwesta Çakır

rexne kir û hate gotin ku mafê Çakır nîn e ku daxuyaniyeye bi vî rengî bide.

Ev daxuyaniya Çakır rê nişanî polîsan dide da ku ew dest bavêjin hinek kompoyan. Kompoyeke bi vî rengî bi hevkarîya fermandarê cendermeyan û Serokê Belediyeya Esenyurtê Gürbüz Çapan ve li ser rayedarên HADEP'a Esenyurtê pêk hat. Rayedarên HADEP'a vê navçeyê wekî amadekarên çalakiyên tolhildanê hatin nişandayin û hatin girtin. Li gorî daxuyaniya lêqewimiyên ve kompoyê Gürbüz Çapan teklîfa hevkarîyê li wan kiriye, piştî ku wan ev teklîf nepejirandîye, ev komplo hatiye lidarxistin.

Li aliyê din piştî çalakiyên tolhildanê yên kurdan û daxuyaniya hişyarkirinê ya ku ARGK'ê roja 15'ê adara 1999'an da, dewletên cur bi cur ji hemwelatîyên xwe xwest ku neçin Tirkiyeyê. Daxuyaniya ARGK'ê ya li ser mijarê di çapemeniya navneteweyî de gelekî deng veda û digel ajansên mîna Associated Press, Reuters û BBC, rojnameyên mîna Neue Rhein Zeitung, La Republica, Tages Anzeiger, Frankfurter Allgemeine, Der Standard, New York Times, Le Monde cih da daxuyaniyê. Di nûçe û şîroveyan li ser mijarê de têne gotin ku dê ev çalakiyên kurdan dahatûya dewleta tirk a ji turizmê kêmkir bike. Her wiha hatiye gotin ku ji niha ve gelek dewletan hemwelatîyên xwe hişyar kirine û gelek kesan jî rezervasyonên xwe betal kirine.

NAVENDA NÛÇEYAN

Gotinên pêşiyên û biwêj kakilê zimên in

Gotinên pêşiyên û biwêj çavdêrî, tecrûbe û dahûrandinên mirovan ên bi sedan salan di xwe de dihewînin. Nifşên berê bi riya van gotinên watedar ceribandî û çavdêriyên xwe yê li ser surîştê û civakê ragihandine nifşên nû. Ev tecrûbe û çavdêriyên xwe bi riya analîzên xwe bi awayekî surîştî li bêjînga dirokê xistine, ji bo ku nifşên tîn wan kêmasî û şaşiyên wan dubare nekin hewl dane. Mirov dikare van çavdêriyan bike du bir: 1-Çavdêriyên li ser surîştê: Mirov di encama raçavkirina rûdan û tevgerên surîştê de gihiştîne hin encamên watedar ew li rastiya jiyana civakî anîne. Bo nimûne, "Kurmê darê ne ji darê be dar narize.", "Ewrê reş mizgîniya baranê ewrê spî mizgîniya zivistanê." Ev gotin di encama çavdêriyên surîştî de derketine holê lê ji bo ku rastiya têkiliyên civakî binin zimên tene bikaranîn. 2- Çavdêriyên li ser têkiliyên civakî: Mirov têkiliyên civakî raçav dike û çî erênî çî neyînî hin encaman jê derdixe. Mînak: "Zikê tîr hay ji zikê birçî nîn e."

Gotinên pêşiyên û biwêj kakilê zimên in. Bêyî wan ziman dibe wekî qalikekî vala. Tu tam û çêj ji zimên nayê girtin. Şûna ku mirov bûyerekê bi dehan peyvan bîne zimên bi gotineke pêşiyên an jî biwêjekê bi kurtayî û bi rengekî zelal tîne zimên. Hevokên navborî axaftinê herikbar, şayik û berbiçavtir dikin.

Peyvên ku di nav wan de cih digirin êdî dibin qalib. Peyv ji wateya xwe ya rastîn dûr dikevin û mecazî ne. Cihê peyvan nayê guherandin an jî li şûna peyvekê hemwateya wê nayê bi cih kirin. Bo nimûne:

Bi peyvê sifir nabe zêr. (rast e)
Bi gotinê sifir nabe zêr. (çewt e)
Roj bi bêjîngê nayê veşartin. (rast e)
Bi bêjîngê roj nayê veşartin. (çewt e)

Ji bo ku kurd di jiyana rojane de; di berhemên nivîskî de zimanê zikmakî zengîn û şayik bikin divê gotinên pêşiyên û biwêjan bi berfirehî bi kar binin. Her wiha bikaranîna tiştên navborî ji bo rêlibergirtina bi zimanekî din fikirîne pir girîng in. Lewre biwêj û gotinên pêşiyên di heman katê de rewşa aborî-civakî û psîko-sosyal a civakê didin der, derûniya civakê li ber çavan radixin. Bi taybetî di nav kurmancan de çî devkî çî nivîskî mînakên tirkî fikirîne darî çavan in. Ev yek jî bi taybetî di gotinên pêşiyên û biwêjan de xwe dide der. Em dikarin çend nimûneyên ku di kovar, pirtûk û televîzyonên kurdî de bala me kişandine bidarîşin: "Min pirtûkxane şe kir" (Kü-



tûphaneyi taradim), "bi paş ve hejmartinê dest pê kir" (geriye doğru sayım başladı, nûçeyeke MED TV'yê), Emê hevdu bibinin (Görüştük), "Emê pêşketinê li Kurdistanê û cihanê pêşkeşî we bikin." Belê mînakên ku li jor hatine rêzkirin tirkî fikirîne bi awayekî zelal li ber çavan radixin.

Gotinên pêşiyên

Di vê beşê de emê bi taybetî li ser gotinên pêşiyên rawestînin. Wekî tê zanîn gotinên pêşiyên hukmekî diyar dikin, di nav wan de pend hene. Emê hin gotinên pêşiyên ên kurdî ku di jiyana rojane de pêdivî bi wan heye, u digel şîrovekirina wan rêz bikin, hin ji wan jixwe hewcedarî şîrovekî nîn in. Her wiha emê yê ku hemwateyên wan ên tirkî hene jî digel tirkîya wan binivîsin.

Aqilê sivik barê giran e.
Ji bo kesê kêmaqil tê gotin.
Xwedê çiyê dibîne berfê ser de dibarîne.

"Böyle başa böyle tıraş"
Kurmê darê ne ji darê be dar narize.
(zewala darê tune)

Zikreşî û hesûdiya di nav komekê an jî civakê de tîne zimên.

Aşê dîna bêav digere.
Di vir de şibandîna heye. Aş serê mirov e av jî aqilê mirov e.

Av bi bêjîngê nayê beravkirin.
Tirkîya wê "Akıntıya kürek sallamak."

Roj bi bêjîngê nayê veşartin.
Tirkîya wê "Güneş balçıkla sıvanmaz."

Avê ku da serî ha buhisteke ha çar tîlî

Piştî ku bîyûmî û bîxêriyek qewimî ha kêma ha zêde tiştê naguhere.

Barê biaqila piştî bêaqila ye.
Mirovên kêmaqil herdem barê mirovên jîr û şarezî hildigirin.

Aqil taca zêrîne e di serê hemû kesî de tunîne.

Di vir de aqil dişibe tiştêkî heja ku peydakirina wîwê dijwar e.

Zevîye pir e pak e zîpikê lîxist.
Tu çî biçînî di kodika xwe de dibînî.
Tirkîya wê "Neyî ekersen onu biçsin."

Iraqiya beleş mele jî vedixwin.
"Bedava sirke baldan tatlıdır."
Gisnê xebatkaran dişirise.
"Çalışan demir ışıldar."
Golika malê jî gayê malê natirse.

Gîsin zingar nabe.
"Çalışan demir paslanmaz."
Hesin bi germî ditewe
(ağaç yaş iken eğilir)
Mala bêmalxwê mîna xwarina bêxwê ye.

Çawa ku xwarineke bêxwê ne çêdar be kom an jî civakeke bêserkêş jî bêserûber e.

Mala virekan xerab bûye kesî jê bawer nekiriye.

"Yalancının evi yanmış kimse inanmamış."

Bi peyvê sifir nabe zêr.

"Lafla peynir gemisi yürümez."

Bi gote got mirov naçe cot. (lafla peynir...)

Ahê bizina kol ji bizgina kel re namîne.

Mirovên bindest û xizan di dawîya dawîn de ji zilm û hovîtiya serdestan difilitin.

Roviyê geryayî şêrê ketî çêtir e.
Lingê pêxasî ber derê soldirû ye.

"Tilkinin dönüp dolaşacağı yer kürkü çü dükkandır."

Ecelê bizinê tê, diçe nanê şivên dixwe.
Bila mirov kuştîyê şêran be ne girtîyê roviyan be.

Bila mirov bi destê mîrxasan bê kuştin lê ne di bin destê zikreş û tirsonekan de be.

Erd dibe bost dijmin nabe dost.
Rih dibe bost dijmin nabe dost.

Bila şaristan be ne goristan be.
"Gurbette olsun mezar da olmasın."

Zikê tîr hay ji zikê birçî nîn e.
"Tok açın halinden anlamaz."

Bila li şovê be ne li benderê e
"Pazarlık harmanda değil nadasta olsun."

Peza tenê guraxwarî ye.
Peza tenê kefa ber devê gur e.

"Yalnız kuzuyu kurt kapar."
Siwarê hespê xelkê tim peya ye.

"Elin ipi ile kuyuya inilmez."
Ga dimire çerm dimîne mîr dimire nav dimîne.

Xêrê bike mala xwe de nemîne.
Rastî bibe derzî jî naşikê.

Mirazê bédil, wekî wekî caniyê bêhefsar û bêcil.

Guh bide ilmê melê guh nede şuxulê melê.

"imamin yolunda git ama yaptığını yapma"

Bar merivan nakuje serbar merivan di kuje.

Çavên deriya xwelî li seriya.
Şev yek in diz hezar in.

(Beşa li ser biwêjan dê bidome)

Li ser rexneya hefteya çûyî çend têbinî

Her rexneya xwendevanê me girîng e, heke neyê weşandin jî li ber çavan tê girtin. Reng e ku hevalê Gernas jî ev nivîsa hefteya çûyî bo weşandinê neşandibe, lê ji ber ku ew xwest ew rûpel wekî platformekê karê xwe rabe, ev nivîs hate weşandin. Her wiha me xwest ku mirovên din jî dîtî û ramanên hevalê Gernas agahdar bibin û ew jî li ser zimên bi çalakiyê û li ser zimanê rojnameyê bi taybetî nivîsan bişînin. Bes, wekî her peyv û hevoka çewt, rexneyên çewt jî divê bê rastkirin. Ji bo vê yekê me pêwîstî bi nivîseke wiha dît.

Di nivîsê çewtiya herî berbiçav ev e. Ji bo mînakên ku hatine rêzkirin, çavkanî nehatiye nîşandayin, diviya jî her mînakê bihata destnîşankirin û ku me jî bizaniya ka bi rastî peyvên ew dibêje bi wî rengî derketine, an na. Hinek peyv ji wan çewt hatine pêşkirin wekî "fêrulzanîn, konevanzanîn (konevanîzanî), civatzanîn (Civakzanî, civaknasî)"; hinek peyv bi salan e di kurdî de têne bikaranîn û êdî wan cihê ew girtiye wekî "bûyer, dartiraş, xwe-ros, hevedudanî, berik". Lê hevalê Gernas ev peyv, wekî peyvên çêkirî nîşan dane. Ji bo ku mirov van peyvên wekî peyvên çêkirî bibîne divê ji zimanê nivîskî qet haya mirov nîn be.

Bi taybetî peyva "hevedudanî" pêşî

ji hêla Celadet Bedirxan ve hatiye bikaranîn. Vê peyvê bi vî rengî di Hawar û Ronahiyê de cih girtiye. Her wiha peyva "bûyer" ji bûyinê tê û paşgira /-er/ di kurdî de bi berfirehî tê bikaranîn. Gelek peyvên ku bi vê paşgirê hatine dariştin hene. Nimûne: Daner, nûner û hwd. Vê peyvê wekî têgiheke rojnamegeriyê cihê xwe girtiye û hatiye pejirandin.

Me ji dahûrandina heval Gernas ya li ser firotay tiştêk fêm nekir. Di kurdî paşgîrêkî bi rengê /-ay/ nîn e. Lewre jî ev peyv ne cihê xwe de ye. Heke hevalê Gernas, dahûrandina xwe bi çend mînakên zelaltir bikira dê baştir bibûya.

Em werin ser peyva "Xwefiros". Em nizanin ka bo çî wî ev peyv wekî peyveke çêkirî bi nav kiriye? Lewre ev peyve ji mêj ve di nav gel de tê bikaranîn.

Li aliyê din bi alîkariya cînavkê "xwe" û koka dema niha ya hinek lêkeran gelek peyv hatine afirandin û di nava gel de têne bikaranîn wekî xwekuj, xwenas, xwepereş û hwd. Peyva "kurmancîaxêv" nû ye û tu têkiliya wê bi tirkî re nîn e, li gorî rêzimanê kurdî hatiye dariştin. Peyva "dartiraş" jî gelêrî ye û nû nehatiye çêkirin û di tirkî de jî qalibekî bi vî rengî nîn e.

Xala duyemîn, mînakên ku li ser hevokan hatine dayin jî di nava xwe de gelek çewtiyan dihewînin. Mînak lêkera "bazdan" wekî lêkereke negerguhez hatiye dîtî û lewre jî hevoka me çewt hatiye dîtî, lê di vê lêkera hevedudanî de, peyva ku rengê lêkerê di de wê /dan/ le û lêkera dan jî lêkereke gerguhez, lewre jî dema borî ya vê hevokê divê bi cînavka "min" dest pê bike.

Peyva çerçewe gelek nakokiyan bi xwe re tîne, lewre jî di kurdî de hê dirûvekî teqez negirtiye. Li gorî hinekan ew jî peyvên çar û çowe tê, li gorî hinekên din bingeha wê çar û çavî ye. Lê di rojnameyê de jê re dirûvekî tekane divê bê destnîşankirin. Heman tişt jî bo "nihêrtin" jî rast e.

Tiştên ku li ser waneyê hatine gotin ne cihê xwe de ne, lewre, peyva "bi serê xwe tu wateyê nadin" çewt hatiye fêmkirin. Her peyv ramanekê yan jî heyberekê dinimîn, lê gihanek (bağ-laç) tu tiştî nanimîn hevokê temam dikiñ. Mirov dikare ji bo her tiştî ji zimanekî din wateyekê bibîne. Wekî mînak /û/ bi serê xwe tu wateyê nade, lê tirkîya wê "ve" û îngilîziya wê jî "and" e. Li nik vê yekê hinek ji wan mînakên di nava hevokê de bi karê gihanekê radibin, lê bi binyata xwe de ne gihanek in, lewre jî hinek beşên wan watedar

in. Wekî dem, ser û hwd.

Di dawiyê de em dixwazin bidin xuyakirin ku em bi dil û can beşdarî dîtînen hevalê Gernas ên di encamê de dibin û bi vê berpirsiyê xebata xwe dimeşînin. Lê Rojname bi tenê ji nivîsê çend kesên ku li navenda rojnameyê dixebitin dernakeve, wê şax û guliyên xwe gihandine hemû Kurdistanê û seranserê cihanê, lewre jî ihtîmala marjînalbûnê li holê nîn e. Îro ji seranserê Kurdistan û her cihê ku kurd lê dijîn nivîs ji rojnameyê re têne şandin û ev yek jî bandora xwe li zimanê xebatkarên rojnameyê dike. Ew jî bandora neyinî ya li ser zimanê xebatkarên rojnameyê dişikene.

Xaleke din jî em dixwazin ji tesbîten hevalê Gernas zêde bikin: Bi guherîna civakê re, ziman jî diguhere, Li gorî pêwîstiyên nû yên civakê peyvên nû têne afirandin û hinek peyvên kevn jî wateyên nû digirin. Her wiha ziman ji hev digel peyvên, hinek qalib û şayesana jî qerz dikan, ev yek heke di bin çavdêriya zanyaran de pêk were ziman zengîn dike. Lewre jî divê mirov di vî warî de zêde hişk û reqne be û li hemberî peyvên nû zêde bi şik û guman tevnege. Divê neyê jîbîrkirin ku ziman jî wekî civakê heyberekî jîndar e, li gorî pêwîstiyên civakê dirûv digire.

SAMÎ BERBANG

Ne tirse loo...

NEJDET BULDAN



E-Mail: Buldan@compuserve.com

Dewleta tirk zû kete tengasiyan. Dibêjin PKK bi riya MED-TV banga êrişan li endamên xwe dike û êrişên terorîstî li me tê kirin. Dixwazin li aliyekî raya giştî li hemberî êrişan hişyar bikin û raya giştî ya navneteweyî li dijî MED-TV'yê bi kar bînin.

Li Ewrûpayê ji xebateke wan dijî li televîzyona kurd û rojnameya Özgür Politika heye.

Sendîkaya Şoreşger a Tirkan (DİSK) banga çalakiyekê dike ku li hemberî çalakiyên bombeyî bisekinin.

Serokomarê tirk digot: "Bila gelekî bi ser me de neyên. Heke gelekî bi hişkayî bîn em ê mîna Yugoslaviyê bikin."

Dîsa serokomarê wan digot: "Ew rewş rewşên nazik in. Heke em mecbûr man,

wê paqijiyê etnikî çêbibe.."

Demên borî em li Avusturyê bûn. Gelek hevdîtînen girîng hatin çêkirin û civîneke çapemeniyê hate lidarxistin, di civînê de li ser rewşa Kurdistanê û Öcalanli gelek axaftin hatin kirin. Wê demê me bala wan dikîşand. Hingî tu çalakî nebûn. Piştî ku çalakiyan dest pê kir çapemeniya wan a alîgirê tirkan dengê xwe bilind kir. Wan digot ku kurd hatine wê derê û gef li Tirkiyeyê xwarine.

Ew tişt bi giştî piştî girtina Öcalan derketine holê. Gelê kurd rabû ser xwe. Saziyeke nû ya tolhildanê, dengê xwe bi çend çalakiyan derxist. Hê em nizanin ka ew sazî xurt e, an ne. Dîsa em nizanin ku ê bibe bersiva hovîtiya tirkan an nebe. Ez bawer nakim ku tu çalakî bibin bersiva hovîtiya ku tirkan pêk aniye. Lê hêvî tu caran naşkê. Em ê li bendê bin.

Mijara me ne çalakiyên hêzekê ne. Lê tiştê herî balkêş helwesta raya giştî ya Ewrûpa û Tirkiyeyê ye. Ewrûpayiyên ku bi salan temaşevaniya hovîtiya tirkan dikir, niha çima dikevin nava fikaran? Ma gundên ku dihatin şewitandin, mirovên


xalixerez (biguneh) ên ku dihatin kuştin û berzekirin, koçberiya milyonan bala we nedikişand? Welat tev hate wêrankirin û valakirin, hingî hûn li ku derê bûn? Şev û rojên me bi tirsê tijî bûbûn, gelo we tu agahdarî nedistand? Hemû hevdîtî û tîkiliyên me ne li ser wan bûyeran bûn?

Her wiha çapemeniya tirk, sendîkayên wan û rewşên bîrên bi mîltarîzmê ve girêdayî. Roj baş. Dema we hemû barbariya dewleta xwe bi çepelan hembêz dikir, qet nedihate bîra we ku gelek kes jî digirin? An ên me mirov nebûn? Karmend û gel nebûn? Zar û zêç, jin û jiyan nebû ku bi destê dewletekê dihatê vemirandin. Jiyanekê ku bi alîkariya we dihatê reşkirin, ne jiyan bû?

Mêzeke tirko, çavên xwe baş veke. Bi rastî me ne dixwest em bigirin, ne jî hûn. Lê mixabin, riya giriyê û xwînê we nîşanî me da. Qirkirina ermeniyên û hovîtiya we ji bîra tu kesî neçûye. Ez nizamim, hûn çima wisa zû tirsîyan. Li gundê me gotineke mezinan hebû. "Tu çi diçînî, ewê hiltîni". Nizamim, hat famkirin an na?

Newrozîna Serhildanan û jiyanêke serfiraz: Welathan Gülşenoğlu

Hevalê Welat hem li Kurdistanê û hem jî li Tirkîyeyê bi çavên serê xwe hovitiya dijmin dibîne, lewre ew, pêwîstiya çalakiyên diwartir fîne ser zimên. Ji ber vê hindê bi awayekî aktîftir di nava çalakiyan de cih digire. ermî û dilsoziya xwe ya bo têkoşînê, di nava hevalên xwe de darî çav dibe.



Welathan Gülşen di demên herî dijwar ên şoreşê de hem li welêt û hem jî li metropolan di nava têkoşînê de cih digire. Ew, di sala 1993'an li Zanîngeha Marmarayê dest bi xwendinê dike. Ew, roja 23 adarê 1994'an piştî çalakiyekê tê girtin û di cih de wî bêmahkeme înfaz dikin.

Gobilîna berxwedanê ye Newroz, ku ji kûrahiya dîrokê radibe. Bi her şehadetê ajdana azadiyê ye Newroz. Şehîdên Newrozê, agirê şoreşê bi bi laşên xwe geş kirin û bi vî awayî hêvî guhaztin berxwedanê, berxwedan jî guhaztin serkeftinê. Li şûnewara koletî û xiyaretê, wekî berfînê bişkiyîn şehîdên Newrozê....!

Hevalê Welat di 19 saliya xwe de xwe gihand refên pakrewanên şoreşê. Kela dilê wî bi evîn û doza welat, gel û şoreşê radibû. Hevalê Welat di sala 1974'an de li navçeya Dêrikê bi ser Mêrdînê ve, wekî zarokê malbateke maldar û dewlemend tê darê dinyayê. Ji ber maldarî û oldariya malbata wî, ew wekî zarokê şermoke mezin dibê. Ev helwesta malbata wî, tesîreke mezin li kesayetiya wî dike lewre ew di demên xwe yê herî çalak û dilçûş de, bi derdora xwe re têkiliyê daneyne, wekî mirovekî bêdeng û şermoke tevdigere. Lê ji ber kesayetiya xwe ya têngiştî, jidilûcan û dilsoz, li derdorê her kes hez jê dike û qedra wî digire.

Dema zanîngehê

Di dema lîseyê de hevalên wî, çalakiyên gerîla û serhildan tesîreke mezin li Hevalê Welat dikan. Bi vî awayî tovê

têkoşînê di dilê wî de dibişkive û zanabûna welatparêzî lê peyda dibe. Li pey vê, gir û rika wî ya li dijî dijmin gur dibe.

Hevalê Welat di sala 1993'yan de li Zanîngeha Marmarayê di beşa Wêje û Zimanê Îngîlîzî de dest bi perwerdehiya zanîngehê dike. Li vê derê di demê kurte ligel Yekîtiya Ciwanên Kurdistanê pêwendiyê datîne. Li aliyê din têkiliya mirovên metropolan ya pûç û durû û her wiha hovitiya Komara Tirk ya li ser kurdan dike ku ew li rêbazên nû bikole. Ji bo ku ew rûye dijmin hem li Kurdistanê û hem jî li Tirkîyeyê bi çavên serê xwe dibîne, kela dilê wî gelekî dijwar radibe û pêwîstiya çalakiyên karîger û diwartir fîne ser zimên. Ji ber vê hindê bi awayekî çalak û aktîftir di nava çalakiyan de cih digire. Hevalê Welat ji ber dilgermî, jidilûcanî û dilsoziya xwe ya bo têkoşînê, di nava hevalên xwe de darî çav dibe û her kes ji wî re rêz digire.


Di pêvajoyê de ew li rewşa welat û têkoşînê dikole lewre dide xwendinê. Xwendin û lêkolîn dibe taybetiyê kesayetiya wî. Her wiha ew lê dixebite ku vê yekê li hevalên xwe jî ferz bike. Ew tevî karûbarê rêxistinê, girîngiya çalakiyan jî destnîşan dike. Hevalê Welat di sala 1994'an de bo şerê germ

hazir û amade dibe. Biryardariya wî ya bo şer û têkoşînê, dike ku ew di warê jiyanê de hin guherînan pêk bîne. Li pey vê pêvajoyê di hemû çalakiyan de cih digire. Di vê navê de ji malbata wî hin kes hewl didin xwe ku wî ji nav refên têkoşînê hilînin, berê wî bidin rêxistinên reformîst. Lê tevî hemû tevgê û xebatên malbata wî jî, ew pî dide ser refên şoreş û şerê.

Di vê demê de ji ber ku di pîrozbahiyên Newrozê de 10 Kurdistanî şehîd ketibûn, hêrs û rika Hevalê Welat diwartir kiribû. Li salên 90'î pêşketina Têkoşîna Neteweyî ya Kurdistanê tirs û saw xist dilê dijmin. Li pey vê pêvajoyê, dijmin pîrozbahiyên Newrozê wekî serhildan hesibandin û lewre jî bi diwartir berê xwe da wan. Di salên 1991-1993'yan de serhildanên gel, bi çewsandin û xedariyê mezin re rû bi rû ma û bi sedan kes hatin qetlîkirin. Di sala 1994'da jî dijmin bi heman awayî berê xwe da gel, bi sedan kes hatin binçavkirin.

Gülşen li ser rê hate qetlîkirin

Li hemberî tevkujî û zordariya dijmin ciwanên kurd ên li metropolan rapariyan. Li ser tevgêrên dijmin ciwanên kurd biryara çalakî û xwepêşandan digirin. Di roja 23'ê



Şêva Dil

"ji bo şehîd Cemal Elîbapîr"

Eger ji çiya hûn bipirsin

Cemal kî ye?

Lûtê xwe nîşanî we dide.

Eger ji çem hûn bipirsin

Cemal kî ye?

dibê guh bidin

xuşexuşa pêlên min

Eger ji baxan hûn bipirsin

Cemal kî ye?

Dibê bêhn bikin gulên ser guliyên min.

Eger ji jar û belengazên

vê Kurdistanê jî bipirsin

Cemal kî ye?

Destên xwe yê çepê

datînin ser şêva dil.

Şêrko Bêkes

adarê sala 1994'an de li Kasımpaşaya Stenbolê ciwanên kurd ligel ciwanên DHP'î bi sloganên "An neman an serkeftin" û "Kurdistan dê bi serkeftin" dest bi çalakiyê dikan û bi molotofan trafikê asê dikan û her wiha bankayên li derdorê didin ber êgir. Di navê de pankarta ku li ser "An serkeftin an serkeftin" dinivîsê û ala eniyê tê daleqandin. Li dawiya çalakiyê girse bi dilçûşiyê mezin slogana "Bijî Serok Apo" hildide û çalakiya xwe bi serî dike.

Dawiya vê çalakiyê, di dema belavbûnê de faşîst û polîsên sîvil êrîşî ciwanên welatparêz dikan. Beramberî vê êrîşê ciwanên welatparêz bi molotofan li wan vedigerînin. Li pey van molotofan, polîs ciwanên welatparêz gulebaran dikan lê ew di nava kolanan de belav dibin. Di vê navê de Hevalê Welat ji aliyê dijmin ve dîl tê girtin û li ser rîya Kasımpaşa îşkenceyê li wî dikan. Piştî demekê jî guleyekê di serê wî de berdidin û wî qetlî dikan. Bi vî awayî Hevalê Welat roja 23'ê adarê 1994'an de digihêje refên pakrewanên Kurdistanê.

Têbînî: Ev nivîs, ji hejmara taybet a Şehîdên Metropol Marmarayê ya Kovara Ehmedê Xanî ya roja 27 sermawezê 1995'an hate wergerandin û bo kurdî hate wergerandin. Kovar li girtigehê tê weşandin.

□ 21 Adar 1937:

Serhildana Dêrsimê dest pê kir

Roja 21'ê Adarê gelê Dêrsimê Pira Kahmûdê şewitand û êrişî ser qereqola Sîmê kir. Ev bûyer wekî destpêka Serhildana Seyid Rîza û Dêrsimê tê qebûl kirin.

□ 21 adar 1992:

Serhildanên Cizîr û Nisêbînê:

Di sala 1992'yan de li seranserê Kurdistanê xwepêşandanên ji bo Newrozê çêbûn. Lê wê pîrozbahiyê li Cizîr û Nisêbînê rengê serhildanê girt. Di encamê de 95 kes ji aliyê dewleta tirk ve hatin qetilkirin.

BÛYERINE JI DÎROKÊ



□ 21 Adar 1998:

Sema Yüce agir bi bedena xwe xist


Girtiya PKK'yî Sema Yüce, ji bo protestokirina zordariyên li ser gelê kurd, polîtîkayên tunekirinê û şerê qirêjî li Girtîgeha Sergirtî ya Çanakkaleyê, şeva 21'ê adarê kolonya bi ser xwe de kir agir bi bedena xwe xist. Sema Yüce di 1992'yan de di şerekî li Agiriyê de hatibû binçavkirin. Dûv re bi 22 salan hatibû cezekirin. Sema Yüce piştî ku agir bi bedena xwe xist bi demekê 17'ê pûşpera 1998'an kete nav refên şehîdan. Yüce ji Dutaxa Agirî û 22 salî bû.

Înstîtuya Kurdî ji nû ve

Piştî komploya navneteweyî ya li dijî Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan, nijadperestên tirk ên li Ewropayê ji çalakiyên terorîstî li dar xistibûn. Yek ji van êrişên terorîstî jî şewitandina Înstîtuya Kurdî ya li Brukselê bû. Nijadperestên tirk di pêvajoya Romayê de, ligel hin êrişên din ên li ser saziyên kurdan, Înstîtuya Kurdî ya li Brukselê jî şewitandibûn, lê înstîtu ji nûve bi hêztir hate vekirin. Înstîtuya Kurdî ya li Brukselê, hefteya borî bi alîkarî û piştgiriya kurd û dostên kurdan, careke din bi hêzeke xurt vebû. Înstîtuya Kurdî bi beşdariya Serokê Bajarê Hernet Senator Willy Kuijpers, Nûnerê PKDW'ê Remzi Kartal, Nûnerê Info-Türk'ê Doğan Özgüden, Prof. Jean Emile Humblet, Senatorê (Wallon), Cîgirê Serokê Herêma Saint-Josse-Noode, Komeleya asûrî-suryanî-keldaniyên Mezopotamya, Nûnerê Komeleya Ermeniyên Demokrat ên li Brukselê Poğuz Ökmen, Serokê Înstîtuya Kurdî Derwêş Ferho û nivîskarê kurd Medenî Ferho vebû.

Willy Kuijpers di axaftina xwe ya vekirina saziya kurdî de, wiha got: "Dewleta tirk ne tenê li Tirkiyeyê û Kurdistanê êrişî ser kurdan dike. Ew li Ewropa yê jî dixwaze saziyên kurdan bigire. Mînakê herî berbiçav, êrişên li ser televizyona kurdî MED-TVyê ne. Dewleta tirk ji çanda kurdan re jî, tehamûl nake. Ez gelek caran çûme Kurdistanê, min rewşa gelê kurd ji nêz ve dît. Ew zordariyên ku leşkerên tirk li Kurdistanê didin meşandin, min bi çavên xwe dît. Min dît ku mirov li ser zikên wan bi erdê ve dixiriqandin. Ev tê wateya dijmorvahiyê. Saziyên ku ji bo parastina çanda kurdî xebatê dikin, ên demokratîk dibin hedefa tirkan, ev ne tiştekî rast e, ew sazî dixwazin Tirkiye jî bibe dewleteke demokratîk." Senator Kuijpers her wiha bal kişand ser sînyalên ku dewleta tirk berî niha avêtin televizyona kurdî Med-TV jî û wiha got: "Şewitandina Înstîtuya Kurdî û Komeleya Çanda Kurdî û Asûrî-Suryaniyan delîlên herî berbiçav in. Lê em din xuyakirin ku em dê piştgiriya xwe ya dostanî ji bo gelê kurd û saziyên wî berdewam bikin."

Nûnerê PKDW'ê Remzi Kartal jî, di axaftina xwe de, diyar kir ku ew tenê dostaniya gelan dixwazin. Kartal wiha got: "Heta îro gelê kurd dijîminatiya tu miletî nekiriye. Lê em dibînin ku li hemberî gelê kurd û serokatîya wî komployeke navneteweyî hîna jî berdewam e. Bi vê komploya navneteweyî re, Serokê PKK'ê birêz Abdullah Öcalan dil ketiye dest dewleta tirk. Em dixwazin ku dostên kurdan ên li her çar aliyên dinyayê, bêdeng nemînin û ji bo çareseriyê pirs



Remzi Kartal

girêka Kurdistanê û birêz Öcalan têkevin nava hewldanan. Em ji gelên ewrûpî yê demokratîk dixwazin ku helwesta xwe li dijî terorîzm û mîlîtarîzma tirk bidin nîşan. Dewleta tirk miletê, rom, ermenî, û asûrî-suryanî ji Mezopotamyayê derxis heta ku xilas kir. Niha dixwaze kurdan biqedîne. Daxwaza gelê kurd, jiyanê wê xwe û azad e. Lewra em dibêjin pêwîst e gel û welatên Ewropa piştgiriya gelê kurd û van saziyên kurdan bikin." Nûnerê PKDW'ê Remzi Kartal axaftina xwe wiha qedand: "Yanî em hêvî dikin Ewropa êdî bê însiyatîf nemîne û qerarekê bigire destê xwe û ji bo mafê gelan bixebite. Em jî weke Parlementa Kuridstan heta dawiyê ji bo çareseriyê siyasî û ji bo azadiya gelê kurd em dê xebata xwe berdewam bikin. Em hêvî dikin ev Înstîtuya Kurdî jî, ji îro pêştir wê di vî aliyê de rola xwe bilîze."

Her wiha nûnerê Komeleya Ermeniyên Demokrat li Belçîka Poğuz Ökmen jî got: "Dîroka dewleta tirk her bi qelandina kêma-neteweyan hatiye nivîsandin. Di dîrokê de, tim û tim gelê kurd û ermenî bi hev û din re jiyane lê ji osmaniyan bigire hetanî komara kemalîzmê her ev her du gel bi hev û din dane kuştin. Lê em dibêjin heta dawî em û kurd birayên hev in û em dê bi hev û din re bijîn."

Gelek şexsiyetên ku nehatibûn pîrozbahiyê jî mesaj şand û piştgiriya xwe dan xuyakirin. Şarîrên belçîkî yê ku hatibûn pîrozbahiyê vekirina Înstîtuya Kurdî, helbestên ku ji bo aştiyê nivîsibûn, xwendin. Di dawiya pîrozbahiyê de, pirtûkên ku înstîtuyê heta niha çap kirine, hatin nîşandayîn.

A.WELAT /BELÇÎKA

ÇAVDÊRÎ

Ma dilê hemlê,
bê dilê dê dibe?



SERKAN BRÛSK

De bila pêlên ji xwîna min, li peravên Girava Îmraliyê bidin û bi şelpîna xwe waweylêya dayikên min, bigihînin roja di nava dîwaran de, hatiye asêkirin. Bila bi her pêleke xwe re, bi milyonan evînan herdin bejahiya vê girava li ber çavên minî reş. Bila bejin bidin ev tov, da ku gul û kulîlk li wan bikeve.

De bila bêhna xwe ya mişt dilsozî bifûrin, bi ser ezmanê vê girava bêbext de û bila ev bêhn xwe di navbera valahiya atomên kevîrên dîwarê zindanê re bidizin û ji Apê me re, bibin hilmeke xweş û mizgîniya berxwedana hevbeş a bakur, başûr, rojhilat û rojava bidin wî. Û bêjin;

Ma evîn tê kuştin? /Ma jiyana tê rawestandî?

Ma roj tê bendkirin û vemirandin? /Nabe, nabe Apê me, ev qet nabe.

Bê te ezman tarî ye, ji rojê xalî ye. Gerdûn îro ji hemû rojan bêhtir, bi hewarî û girî ye. Ey dîwarên ji bin serên neyrên ronahiyê derketine û bi mebesta, ku hêviyan bend bikin, hatine avakirin, hûn, bi hêrs û nefreta gelan tene ricimandin.

Hûnê xwe li ber vê kinê negirin. Bi hezaran kîlometre dîwarên bi rengê we hatibûn avakirin, lê ew yeko yeko bi ser avakirên xwe de hilweşiyên. Dê dema we jî were. Dê dayik û bav vê ji we re jî nehêlin. Dê hêstîrên dayikên şehîdan wekî ava kezabê bi ser we de jî, bibare û dê we jî, ji esas ve bihelîne. Hûnê li ber vê barana kezabê bimînin...

Hûn, dîwarên ku ji azadiyan re dibin nobedar, hûn, ne ker û ne jî, lal in, hûn, derewan dikin, hûn, bi guh in jî. Bi hezaran şehîdan di guhê we de azadî, bang kirine. Dengê Mazlum, Kemal, Xeyrî, Elî çawa ji guhên we dikevin, ey dîwarên derewîn û bêbext. Ne hûn ter in, bi xwîna dilê min. Ne hîn jî, ji we diherike sorîtiya ji bedenên bendewarên evîndarên welêt. Ma ne hîna doh bû, ku bi destên neviçîrkîrên çavsorên Asenayê li zindana Amedê mejiyê sêzdeh dilên azadiyê tevî xwîna wan pişîqî, we û li ser we wênaya îbretê hate neqîşandin û li ser dîwarên dilên me jî, lewhiyên êşê hatin daleqandin.

Dîwarno! Îro, ji hemû rojan bêhtir hiletê min ji we diçe. Hûnê xwe li ber pêlan negirin. De bila ev pêlên ku ji bendava dilan dizin, bêjin; çil milyon dil di nava dilê te de dil in, dilê te di nava dilê çil milyonan de azad e. Belê Apê me, te gotibû; "ez êdî nema karim dilên we di dilê xwe de bigrim. Ezê dilê we azad bikim da ku hûn bi min re, di şerê bêbextan de dil nebin".

Nabe, qet jî, nebû, ma dilê hemlê bê dilê dê dikare bijî?

De bila ezmanê Îmraliyê bi agirê hêrsa dayikan yekser bişewite da ku ewt ewta wan Gurên Boz di gewriya wan de bibe, kazkaz. Li peravên te bêrawestan ewte ewta seyan bagera agir li jiyana min radike.

Hêbûnek ku di vê sedsalê de hilnayê, li hemberî van pêlên ji êgir ku ji xezaba Turaniyên vê serdemê bi xwedî dibe, bi çengên xwe yê ku hêz û qeweta xwe, ji agirê dilê Mazlum û Zekiye digire, li ber xwe dide.

Dil, bawerî, berxwedan û jiyana te, ya gel e. Te, wiha gotibû. Gel jî wiha bersiva te dabû û niha jî ispat dike. Ev peymaneke ku bi hebra dilan hatiye îmezîkirin û bi mohra mejî jî, hatiye mohrkirin.

Peymanên rûreşiyê tî çirandin, ên ku di serê vê sedsalê de li ser me bi tîkbirina bi dehan serhildanan û kuştina bi hezaran egîdan ferz kiribûn. Peymaneke dualî di navbera Rojê û Stêrkê de, di dawiya vê sedsalê de tê mohrkirin.

Hiqûqnas Dr. Mûsa Kaval li ser Kongreya Neteweyî ya Kurdî

Daxwaza herî mezin a dijî

Hin rêxistin dibêjin berî her tişfî, divê nakokiyên di navbera partiyên siyasî de safî bibin, paşê em dê beşdarî kongreyê bibin. Lê ev gotin hincet in û ne xwedî bingeş in. Jixwe armanca kongreyê ew e ku van nakokiyên ji holê rake. Ger nakokî nebûya, jixwe pêdivî bi kongreyê nedima.

Î. CAN DILBIRÎN

Wekî diyar e di roja 19-20 berfanbarê sala 1998'an de li Konferansa li Brûkselê bo roja 21 adarê, biryara ragihandina avakirina Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê hatibû girtin. Em der barê Destûra Kongreya Neteweyî, helwesta rêxistinên ku xwe didin alî, Eniya Partiyên Bakurê Kurdistanê, Konferansa Navneteweyî ya bo Kurdistan û rewşa dawîn ya Başûr ligel Dr. Musa Kaval axivîn.

Birêz Kaval, me dil heye hûn pêşîn li ser xebatên Komîteya Amadekar ya Kongreya Neteweyî me agahdar bikin?

→ Di serî de, ji bo vî karî komîte hatin saz kirin. Komîteya Amadekar ya Kongreya Neteweyî ji 39 kesan pêk tê. Ji nava komîteyê du lijnê hatin saz kirin, yekê karûbarê konferansa li Brûkselê pêk anî. A din jî karê amadekirina Destûrnameya Kongreya Neteweyî hilgirte ser milên xwe.

Vêca ji min hate xwestin ku, ez di nava her du komîteyan de cih bigirim. Ev bû ji salekê zêdetir ku di vê çarçoweyê de xebata xwe didomînim.

Çima we hiqûqê xwend ne beşekî din?

→ Westê ez biçûk bûm, gelek neheqî li malbata min dihate kirin. Min dît ku kesên rewşa wan ya aborî baştir e, dixwazin hinek erd ji bavê min bistînin. Van neheqîyan kir ku ez hiqûqê bixwînim, da ku ez bikaribim parastina mafê her mirovî bikim. Min dixwest bibim dadger an jî parêzer.

Armancên destûrnameyê yên bingehî çî ne?

→ Armancên bingehî ên wê gelek in. Bi kurtî ez dikarim wisa binime zimên:

Yek jê ev e ku îrada gelê kurd bête qebûl kirin û di vê çarçoweyê de kurd bikaribin ji bo xwe hin nûneran hilbijêrin, da ku bikaribin li ser navê kurdan biaxivin.

A duyemîn ev e ku Kongreya Neteweyî bibe dezgeheke bilind, da ku nako-

kî û dijayetiyan ku di navbera hêzên kurdan de çareser bike an jî kêmkirina bike. Kongre dibêse sebebê wê ye ku ji niha û pê de şerê çekdarî di navbera hêzên kurdan de raweste. Ev yek ji armanca wê ya bingeşîne.

Bê guman di navbera hêzên siyasî de nakokî çêdibin, bi taybetî nakokiyên îdeolojîk rû didin. Ev jî tiştekî normal e. Ez dikarim bêjim ev dewlemendiyek e jî. Ma ji ber çî partiyên cuda cuda hene. Ji ber ku partiyên siyasî difikirin û herkes ramanên cuda tîne meydane. Ev partî dîtî û ramanên xwe pêşkêşî gelê dikin û gelê jî li gorî berjewendiyên xwe dikare piştigiriya felan bêvan partiyê bike. Ew jî dihêle ku di dilê gel de dinamîkek peyda bibe û bibe sedema dewlemendiyê fikrî. Her partiyek bêhtir dixwaze bixebite û berjewendiyên gel biparêze. Lewre ev cudahiyan ku di navbera partiyên de hene, divê nebîne sebebê ku berjewendiyên gel werin pûç kirin. An jî ewlehiya neteweyî bikeve talûkê. Armanca kongreyê ew e ku berjewendiyên gelê kurd di ser hemû berwendiyên dîtî re bê girtin.

We got, di navbera hêzên siyasî de nakokî li dar in. Lê em dibînin ku piraniya endamên Komîteya Kongreya Neteweyî ji şexsiyetên kurd yên serbixwe pêk tê?

→ Pirsra we di cih de ye. Gelo çima şexsiyetên serbixwe? Em dikarim bêjin beriya vî bi 5-6 salan dest pê kiriye. Tê bîra min bi taybetî li Fransayê me li ser vî pirsê gotûbêj germ kir. Di sala 1991'ê de li Fransayê hemû hêz û komelên kurdan hatin cem hev. Tenê yek nehatibû û wiha gotibû: "Bila şexsiyetên serbixwe tevê nebin, bila tenê partî beşdar bibin". Êdî me jî di wê demê de got, divê şexsiyetên serbixwe beşdar bibin. Ji ber ku şexsiyetên siyasî yên serbixwe, partî û rêxistinên kurdan nêzîkî hev dikin. Ew bi tu partiyên ve ne girêdayî ne, tîkiliya di navbera wan de xurt dikin. Ji ber ku tîkiliyan wan bi gelek partiyên re hene û ji tu partiyên jî aciz nîn in. Dawiya dawî tiştê herî girîng, ev Kongre gelên Kurdistanê temsîl dike.

Baş e. Hûn dikarin hinekî din ve xa-



Dr. Musa Kaval ji mêj ve li derveyî welêt dijî. Wî, li zanîngehên Ewropayê li ser hiqûqê mal Amadekar ya Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê ye. Bi bawerîya Kaval, bi pêkhatina Kongreya

lê bidin xuyakirin?

→ Bo nimûne di nava komîteyê de ji hemû parçeyên Kurdistanê şexsiyet hene. Her wisa ji diyaspora kurdan kes tê de cih digirin. Li gel vî yekê, gelên din ên Kurdistanî wekî Asûrî-Sûryanî-Keldaniyan di nava komîteyê de ne. Wekî din nûnerên olên cuda yên wekî îslam, êzîdî, elewî û ya herî girîng jinên tê de pir hene. Bi vî awayî mirov dibîne ku temsîlkariyeke cidî, nûnertiyeke baş ya gelê kurd di hundirê Kongreya Neteweyî de tê xuyakirin.

Hinek rêxistinên kurd dibêjin hîna dema kongreyê nehatiye. Hûn vî yekê çawa dinrxînin?

→ Rast e. Ev rêxistin dibêjin: "Pêwîst e berî her tiştî, şerê di navbera kurdan de were sekinandin û nakokiyên di navbera partiyên siyasî de safî bibin, paşê em dê beşdariyê tê de bikin." Lê wexta mirov li delîlên van argumentan dinêre, dibîne ku ev hincet in û tu esasekî xwe yê zanistî, wekî réalîteya siyasetê nayê xuyakirin. Jixwe armanca Kongreyê ew e ku van nakokiyên ji holê rake. Eger nakokî nebûna, jixwe pêdivî bi Kongreyê nedima û niha ji zû de wê Kêşeya Kurd û Kurdistanê çareser bûbû. Ha ji ber çî ev Kongre girîng û pêwîst e? Ji bo ku van alozî û nakokiyên kêmkirina bike. Armançek ji armancên kongreyê, her wekî di destû-

ra wê de hatiye diyarkirin, çaxê nakokîyan jî şer di navbera du hêzên kurdan de rû bide, wê Kongre bêalî bikeve navbera wan û meseleyê çareser bike. Heger dîsa şer raneweste, Kongre ji hinek kesên serbixwe daxwaz dike ku, komîsyoneke serbixwe ji şexsiyetên ku her du alî qebûl bikin pêk were û li ser sebebên vî şerî lêkolînan çêbike. Piştî hingî raporeke amade dikin û tînin Kongreyê, kongre biryaran digire û careke din tîkiliyê datîne.

Wekî Komîteya Amadekar, we ligel partî û hêzên ku li dijî kongreyê, çî berî destûrnameyê çî piştî wê, hevdiîtin saz kiriye?

→ Erê me hevdiîtin çêkirine. Heta heyet hatine çêkirin, da ku biçin bi wan re hevdiîtinan pêk bînin. Min bi xwe jî çend caran di wan heyetandê cih girtiye. Her wiha ji bo wan destûrname hatiye şandin, hevdiîtin çêbûne. Jixwe em dixwazin ku dîtînan xwe li ser bidin zanîn lê mixabin ew partiyên ku nayên beşdar nabin, nêrinên xwe jî nabêjin. Lê ez dixwazim vî ser zêde bikim. Ew rêxistin û partiyên ku dibêjin bila şer bi dawî bibe û paşê em dê Kongreyê dirust bikin. Maneya wê çî ye? Maneya wê, em çêkirina Kongreyê bi nemana şer ve girê didin. Eger hat û piştî du mehên dîtîre careke din şer çêbû, divê em wê kongreyê fesih

axivî:

Min çênebûna Kongreyê ye



kiriye. Kaval yek ji endamên Komîteya Lozanê wê rewşa Rojhilata Navîn sererast bibe.

DR. MUSA KAVAL

Dr. Musa Kaval jî, mîna gelek Kurdistanîyan jiyana xwe bêtirîn li derveyî welatê xwe bihûrandiye û a niha jî li Ewrûpayê dijî. Ew bi binyata malbatî ji herêma Hekarî ye û li gundekî biçûk bi navê "Lewîne" ji dayik bûye. Kaval, berî ku derkeve Ewrûpayê, diçe li Misirê li Zanîngeha Eserê beşa hiqûqê dixwîne. Piştî Misirê ew ji bo doktorayê, di sala 1979'an de diçe li Fransayê bi cih dibe. Di destpêka sala 1992'yan de li Zanîngeha Sorbonê li ser kurdan gelek semîneran amade dibe û ji pisporekî û kesên eleqedar re pêşkêş dibe.

Kaval endamê PKDW û di nava Komîteya Amadekar a Destûra Kongreya Neteweyî de cihê xwe digire. Ew her wiha di MED TV berpirsiyarî û mamostatiya bernameya Zanîngeha Med dibe.

be. Ya herî girîng, her mirov dikare di warê xwe de, bi para xwe cihê xwe di avakirina vê Kongre yê da bigire.

Li Konferansa li Brûkselê bo roja 21 adarê anga Newroza 1999'an biryar danîna Kongre ya Neteweyî ya Kurdistanê hate girtin. Hûn dikarin li ser xebatên xwe yên bo vê yekê me haydar bikin?

→ Bi rastî ev biryar ji bo me pir girîng e. Lewre divê Kongreya Neteweyî di zûtirîn demê were çêkirin. Em dizanin ku gelek asteng hene lê ger her dem mirov bêje asteng heye û wan qebûl bike, pêşveçûn çênabe. Ji bo vê em niha li ser karê pratîk xebatê dikin. Me salnameyek çêkiriye û li gora wê xebata xwe pêk tînin. Ya din jî, biryar hate standin ku bi partî û rêxistin heta niha nehatin re careke din hevdiyan werin çêkirin. Van jivan (randevu) daye me û heyetên me diçin bi wan re hevdiyan çêdikin, bi hêviya ku werin beşdarî Kongre yê bibin. Lê bangêke dîtir jî heye; ji bo wan rêxistin û partiyên ku tevî Kongre yê nabin. Ew dikarin werin wekî çavdêr (gözlemci) beşdarî xebatên kongreyê bibin. Yanî bila werin bi çavên serê xwe xebatên Kongrê bibînin, da bikaribin di pêşerojê de bibin endamê Kongre yê yê timî. Hêviyêke din jî, ji wan partiyên beşdar nabin ev e ku li dijî Kongreyê nesekin. Lewre daxwaza sereke ya dijminên gelê kurd,

Partiyên ku tevî Kongreyê nabin, dikarin werin wekî çavdêr jî beşdarî Kongreyê bibin, da bikaribin di pêşerojê de bibin endamê Kongreyê yê timî. Hêvî ev e ku partiyên beşdarî Kongreyê nabin, li dijî wê nesekin. Lewre çênekirina Kongreyê, daxwaza dijmin ya herî mezin e.

çênekirina Kongre yê ye.

Li aliyê din di rastiyê de yekîtiya kurdan hem ji bo gelê kurd û hem ji bo cîranên kurdan pêşveçûneke pir baş e. Divê ji îro pê ve em neteweyên li Rojhilata Navîn ji hev hez bikin û hev du baş nas bikin. Yanî hebûn û rastiya hev, ya cografîk, dîrokî û siyasî qebûl bikin. Dema ku ev tişt çêbû, wê ew sinorên di navbera gelên rojhilatî de rabirin û nexweşî û nakokiyên wan bi dawî dibin. Yanî em dikarin bêjin, çareserkirina Kêşeya Kurd li Rojhilata Navîn de, ji bo hemû gelên herêmê dê bibe sebebê pêşveçûneke pir xurt Çavê me kurdan ne lê ye ku em herin wan xelkan biêşînin. Daxwaza me ew e, wekî çar neteweyên mezin yê li Rojhilata Navîn bikaribin cihê xwe di pêş de birina herêmê de bigirin. Lê ew mîletên cîran doza perçiqandina me dikin, em jî mecbûr in li ber xwe bidin. Bi vî awayî nexweşî çêdibin, destên biyaniyan dikişin nav me û ew dixwazin me tahrîk bikin. Lê em li dafika wan naqelîbin, ji ber ku em mafê xwe yê mirovatiyê diparêzin. Bi vî awayî ev nexweşî dibin sedem ku gelên herêmê bi pêş de neçin.

Wisa lê tê ku, dewletên din her tim bi me ve mijûl dibin, em jî bi xwe ve mijûl dibin. Lewma ev rewşa Rojhilata Navîn sererast nabe. Em dikarin bêjin ev nexweşiyêke dîrokî ye. Lazim e rojek berî rojekê ev bête safikirin. Mirov dibîne ku rojhilat, navenda şaristaniyê ye. Çima vêgavê ewqasî li paş maye?

Birêz Kaval, hûn dîtina welatên ewrûpî ya bo sazîkirina konferansa navneteweyî ya li ser kurdan çawa dinirxînin?

→ Em jî wekî PKDW'ê hewl didin ku ev konferansa hanê zûtir were çêkirin. Lê heta niha hikumetan li ser vê yekê tu biryar negirtine. Bêguman wexta ev konferans pêk were, divê hukumet biryarê bidin. Lê wexta wan biryar girt, vê gavê pirs girîng tê rojevê: Wê kî di platformê de temsîla kurdan bike? Ew dewletên ku Kurdistan di nav xwe de parçe kiriye û bi taybetî dewleta tirk heta ji destên wê were hewl dide ku kurd neyêne temsîl kirin. Lê eger hat û tiştêkî wiha çêbû, rejîma tirk wê hewl bide ku kurd neyêne temsîl kirin û konferans wekî

Lozanê bi dawî bibe.

Yanî hûn dibêjin ger kurd yekîtiyêke xurt saz nekin Lozana duyem dê pêk were?

→ Armanca wan ew e ku ger hinek biryar werin girtin jî li dijî kurdan bin. Vêca ji ber vê hindê pêwîst e gelê kurd vê talûkê baş bizanibe. Pêwîst e kêliyêkêberî kêliyêkê, rêxistin û partiyên kurd werin ba hev û Kongreya Neteweyî pêk bînin, da ku kurd jî bi nûnerên xwe di wan konferansên de cihê xwe bigrin. Dibe ku konferansêkê têrê neke, belkî gelek konferans jî çêbibin. Vêca pêwîst e her kurdek, wekî me got, li gorî karîna û zanîna xwe bandorê li ser wan partiyên ku nayêne Kongre yê bike. Da ku ev partî û sazî ji gelê xwe bêne bidûrxistin. Yanî kes bila piştgirî û alîkariya wan neke. Heger li cem gelê me ev zihniyet û taktîka wiha peyda bû, wê gavê avakirina Kongreya Neteweyî dibe tiştêkî pir hesanî. Vê gavê tu partî newêre li dijî Kongre yê bisekinin, ji ber ku gel xwe ji wan bi dûr dixê û ew jî dizanin ku ew dê têk biçin.

Hûn rûdanên vê dawiyê ku li Başûr pêk tên çawa dinirxînin û gelo ev rûdan wê tesîreke çawa li Kongre yê bikin?

→ Niha di destûra Kongre yê de, em lihevhatina hêzên kurd pîroz dibînin. Hevkarîya ku di nava kurdan de pêk hatîye, em dirust dibînin. Destûr jî vê dibêje. Qesta min ew biryarên ku di civîna berfireh ya roja 19 û 20 berfanbarê 1998'an de hatine girtin in. Bi şertê ku berjewendiyên gelê kurd ên bilind nêxin talûkê ye, piştgiriya van hêzan hate kirin.

Baş e. Hûn Peymana Washigtonê çawa dibînin?

→ Ji bo vê hevalbendiya ku li Washigtonê di navbera PDK û YNK'ê de çêbûye de Kongre tiştêkî pîroz dibîne û hêvî dibe ku ev itifaqa hanê bibe sebeb xurtkirina hêzên kurdan û yekîtiya kurdan bi leztir bike. Lê wexta were famkirin ku ew hevalbendî wê ji bo dewleteke dagirker bibe malzeme û li dijî gelê kurd be, wê gavê pêwîst e vê yeka hanê bibîne. Jixwe rol û erêkê ji yê Kongre ya neteweyî jî, ku bala gelê kurd bikêşe û bixebite, da ku vê talûkê ji holê rake.

Serpêhatiya dara gûzê

Ez dareke bejin bilind
têr çiqil
xwedî belçimên fireh
û fêkiyên têr tam bûm
Li bin siya min diçêrand
Şivanan
keriyên pezê xwe
bêrivanan şîr didotin
Rêwingiyan bêhna xwe vedikirin
Hêlîna çûk û çivik
bi hezaran mêş û mûri bûm
û mirovan
bi fêkiyên min
têr dikirin zikên birçî

Beravî
tim dihatin cem min
xwe û cil dişûstin
bi bayê ji bakur dihat
stran û lorik difrandin
çiqil û belçimên min
da xweş bikevin xewê, bêtirs
zarokên wan

Wek dotmûrek bûm
di nav hevalan de
û bêgazind em dijiyan
bi dara bi
spîndar
tutirik
cur bi cur bi deviyar re

Şevêk ax!
şevêk mij û moran
şevêk têr şilî
bi dizî hatin
bêbext
neyarên giyanewer
dijminên mirovahiyê
romen reş
Har û dîn
bê îman û bêwijdan bûm
ji bo sûd negirin xwediyên me
şervanên azadiyê
dan ber gulên
bejna min a ter û taze
bi derba mezin a balafirşkênê
ji qurm ketim
li ser rûyê Dîjle
qelaşt zikê wê
Qorînek xwe berda newalê
deng veda li Cûdî

Niha ez dara gûzê me
wek gundiyan xwe
wek Eliyê Eysê
Koçber im
bi çavên kelogirî
bi Çemê Dîjle
ber bi Besrayê

Di rê de min dît,
refek gerîla
ji Endiwerê
diçûn Cûdî

Berken Bereh



Çend Şîlanên Xwekuj

li ser rûyê min vegotinên;
dewsa xwepêşandanên îlegal
ên ku bi darê zorê hatine belavkirin

zilindar hemû stran li ser ziman

min xwe, ji xwe re kiriye şîv
min xwê, ji xwê re kiriye paşîv
heke ûtopiyayên min nîvco nemana,
minê aniha
cercûrek li ser hev di cênika xwe de
vala bikira

rîma destê cengîzê moxol mējû qul
kiriye
hatiye
di buhiştê newqa min de cit bûye
kurmîkê hundirê min ê xwîre û azîb
zewiciye
eşîrek mêr jê çêbûye

êgir bera serê neynûkên dahatûya xwe
didim
jan ji hêviyên min diçin
ne ji wan kesên xwedîsiûd im ku dotma-
ma min dotmîr e
kîjan kulîne, livînên destgirtiyar
li ser hev pêçayî dibînim
ji bin ve hildiweşînim
bi dozînen xwe
li peravên kezêba te ya tirî pêl didim

qaj-waja hestiyên min di devê mênge-
nan de tê hêran
hema tu jî;

gelo bi careke tenê be jî, porê xwe gez
dikî
bimirim heke pepûkê tu yê tenê bikaribî
li kurdîstana min xwedî derkeve
şopa maçîkirinên şevê li ser rûyê te
dibînim
ma ji vir de û kengî tu dikarî bêtî min
rakevî
eşefa xiltên xewên min wê kî bike
xewnên tayê, bêsiibe li min peydabûne
ma tu jî ne bî, wê kî xewnên min
bikewîne kî

fikandinên min ên kurdanda
bêriya lîlandinên te yên têrza kirine
temen bûye hesin, tenê hew dikarim hil-
girim
bi stûnê dîrokî be û têkeve bin çengê
min.
tu xencer,
bi qasî xencerên te li gewriya min
nayên
û tu serî
bi qasî serê min li laşê te nayê
ne tu bî dîne,
ma ez bi qasî kuliya derziyekê jî
dikşînim teşqela vê dîne

destên min tune ne
an na minê piştê giriyê te bifirkanda
Rênas Jiyan

Divê nêvî nemîne şahî

Bablîsok digere
Li ser serê jiyana bi rûmet
li ser bedena bi nirx...

Nîvçe nemîne şahî?
Birêveçûn nîvçe nemîne gelo?
Baran tê...
Bahoz û pûk,
Zîpik û xilolîk
li ser berxwedanê
Di nava herî û çiravê de
dimeşiyar
Dimeşe Apê min!
Her gavek bîst sal e,
bi hêza salên bêteqet
xwe dirêj dike asoyê
Nêzik maye lê...?
Dehfdan pêwîst e,
Ku pirê me
Bigihêje kulîlka xwe
Çiya Mazî

Ziryan

fal hatiye vekirin
ji gotinan re
di rezekî rojhilatî de
sîdank venabin û
dil hênik nakin ziryan

ji min derew
xezalên golê li hev runanên
çîrokên evîne nabêjin
û evîndar nabin...

êdî ji hev hez nakin leyla û ...
dîjle jibîr kiriye nazdariya xwe
Çar Çira diqirîne zehra
brûno
gurtir dike bizotên ji laşê xwe

nêçîr
hesinê kawa ye îro bo seydvanan
weke bizbilîqê be jî
ez dil nakim êdî azadiyê
ji min derew,
lê, rast bûye fala qereçiyê

Emîn Bozan

Navenda Çanda Mezopotamya ya İzmirê

● 20.03.99 şemf: Gotûbêj:

"Çîrok û Dîrok sifra nemerdan" Apê Husên, saet:17.00

● 21.03.99 yekşem:

"Newroz pîroz be" (Di Newrozê de em li meydanan in).

● 24.03.99 çarşem:

"Kawayê Hesinkar û Mîtolojiya Newrozê" Cemşit Bender, saet:18.00

ÇALAKIYÊN HEFTEYÎ



YÇKM

● 20.03.99 şemf: Filmê Jim Sheridan "Ji bo bavê min", saet:16.00

● 21.03.99 yekşem: Bi zimanê huner mirov û civak "Paşeroj û îroyîna hunera plastîk". Beşdar: Ümit Gezgîn. Pêşkêşvan: Nazîf Uslu, saet:15.00

● 26.03.99 în: Filmê Ken Loach 'Strana Carla', saet:19.00

Beksav

Forûm: Sohbetên febrîqeyan-3 Karker hilbijartinan dinirxînin.

Beşdar: Sabri Topçu, Atılay Ayçin, Süleyman Yeter, saet:16.00

● 26.03.99 în: Belgefîlm: "Yılmaz Güney û welatê wî". saet:15.30

Hedefa nû ya dewleta tirk:

Girtina MED-TV

Hefteya çûyî di çapemeniya tirk de bi giranî li ser vê mijarê hate rawestandî. Ji nûçe û nirxandinên ku di nav rûpelên çapemeniya tirk de cih girtine, tê zanîn ku çapemeniya tirk di vî şerî de serkêşiyê dike. Çapemeniya ku ji mêj ve di nav rûpelên xwe de propogandaya şer dike û di êrîşên xwe yê li hemberî gelê kurd de tu pîvanên sincî û pîşeyî li ber çavan nagire, îro xwe wekî parêzerê pîvanên pîşeyî nîşan dide.



Pîştî dîlgirtina Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan, dewleta tirk îcar berê xwe da televîzyona kurdan MED'ê. Li gorî îdiaya rayedarên tirk, navgînên ragihandinê yê kurdên li Ewrûpayê propogandaya şer dikin, lewre jî divê ew bînan qedexekirin. Bi gurbûna çalakiyên kurdan li seranserê cihanê, êrîşên dewleta tirk ên li ser MED-TV jî gur bûn. Di çapemeniya tirk de televîzyona kurd digel saziyên demokratîk ên li Tirkiyeyê wekî hedef hatin nîşandayîn. Rojnameya Hürriyetê bi zimanekî çepel ji Ewrûpayê xwest ku dengê medyaya kurdî bibirin. Roja 6'ê adarê Serokwezîrê Tirkiyeyê Ecevit nameyek ji welatên Ewrûpayê re şand û ji wan welatan heman tişt xwestin. Di nameya Ecevit de bi awayekî vekirî girtina MED-TV û Özgür Politikayê hate xwestin.

Hefteya çûyî di çapemeniya tirk de bi giranî li ser vê mijarê hate rawestandî. Ji nûçe û nirxandinên ku di nav rûpelên çapemeniya tirk de cih girtine, tê zanîn ku çapemeniya tirk di vî şerî de serkêşiyê dike. Çapemeniya ku ji mêj ve di nav rûpelên xwe de propogandaya şer dike û di êrîşên xwe yê li hemberî gelê kurd de tu pîvanên sincî û pîşeyî li ber çavan nagire, îro xwe wekî parêzerê pîvanên pîşeyî nîşan dide.

Derdorên demokratîk balê dikişînin ser helwesta dewleta tirk a li hemberî rojnamegeran û vî nirxandinê dikin: "Dewleta tirk heta roja îro bi dehan rojnamegerên kurd dane kuştin, bi dehan rewşenbîrên kurd û tirk di girtîgehê de ne.

Li gorî lêkolînên saziyên mafên mirovan yek ji welatên ku herî zêde rojnameger lê têne girtin, Tirkiye ye. Niha dewleta tirk ji dewletên Ewrûpayê dixwaze ku ew jî bi heman rêbazan bi ser rojname û televîzyona kurdan de biçin." Heman derdor li ser helwesta Ewrûpayê jî vî yekê dibêjin: "Dewletên ewrûpî yê ku durûtiya wan bi dîlketina Öcalan re derket holê, ji ber ku saziyên ragihandinê yê kurdan rûyê wan ê rastîn nîşanî gelê kurd dide, dibe ku di vî warî de bi dewleta tirk re hevkarîyê bikin. Lewre jî divê gelê kurd û raya giştî ya demokratîk hişyar be."

Berpîrsên saziyên ragihandinê yê kurdan, îdiayên dewleta tirk ên bi rengê "ew sazî propogandaya şer dikin, wiha bersivandin: "Wekî her weşana cihanê saziyên ragihandinê yê kurdî jî reaksiyona tund a gelê kurd radigihîne cihanê. Weşanên me banga şer nakin, nikarin çav û guhên xwe ji reaksiyona gelê kurd re jî bigirin. Îro dema mirov bala xwe dide televîzyon û rojnameyên tirkan, tê dîtin ku ew bi awayekî vekirî propogandaya şer dikin û li ser banga wan li Ewrûpayê gelek saziyên kurdan dibin hedefa êrîşên faşîst ên tirk." Heman kes didin zanîn ku derdê dewleta tirk ne şerxwazî ye, ew dijminê her tiştê tîkildarî kurdariyê ye. Ew dibêjin: "Ji bo dewleta tirk, em di bernamêyên li ser çand û zimanê kurdî de jî propogandaya terorê dikin. Lewre jî divê dewletên Ewrûpayê pêşî bala xwe bidin weşanên rojname û televîzyonên tirk û piştre weşanên me rexne bikin."

NAVENDA NÛÇEYAN

TÎŞK

Xo
parêznayene!



LERZAN JANDÎL

Wunciya aşma adarî ya 6'ê adar Koçgîriye, 7'ê adar hawtemalo qij û hawtemalo pîl. 12'ê ya adar: Darbe, Gazî, 16 adar Helebçe. 21 adar jî Newroze û êb. Nê rojanê bi qedran ebi qedr û qîmet, ebi jan û eş ame re xo vîrî.

Nê rojan derheqê dadgeho ke hemverê birêz Öcalanî de dawa kerd ra, zaf êno qesekerdene. Tayê wazenê ke wa dadgeh hiqûqî û bêhet bo, tayê wazenê ke wa heqa xoparêznayena Öcalanî ebi sindor mebo. Tayê wazenê ke wa şarê xerîbî jî dawa de amade bê ûêb. Na derheq de bawariya mi ebi kilmîyê zerê yew nivîstî de na wa:

Xo parêznayane termînolojê hiqûqî de îspatkerdena bêsûciya xo, yan cî sebêbê kerdanê xo ebi hiqûq îzah kerdena.

Na ca de binge, bêhete, qanûnî biyene, adilbiyene esta.

Serokê PKK birêz A. Öcalan hetê dadgehê Tirkiye ra şikîno na çerçewe de bêro sûcdarkerdene? Ebi kilmîye nê!

1-Mafyaya çek û senedan îspatê na ya. Yanê şar nêşikîno ebi qanûn dênanê xo arêdo, seba naye jî, nêşono dadgehan, hurêndiya naye de heqa xo ebi xo yan jî ebi destanê kesanê bînan parêznen. 2-Yew dawa, ma vacîme dawaya şufa (ön alim hakkı) ebi seran, 20-30 sere devam kena û wunciya jî nêqedîna. 3-Pereyê dadgehan çîno ke yew nameye binivîsnê. Ebi naqê xo, ebi heş û mezgê xo girêdayiyê îktidarî yê. 4-Ruşwet/xûg û korupsiyon zaf dawayan de amo îspatkerdene. 5-Dadgehî hemverê înstî-tusyonanê dewlete yê bînan de ma vacîme polîs ûêb. de bêquwet ê, bêçare yê.

Ma eke dawa siyasî bo se beno?

1-Qanûn de estbiyena kirmancan/kurdan nêşinasîna, îdiaya kurdbiyene êna cezakerdene. Yanê qanûn de cayê kurdan çîno. 2-Hiqûq bê qanûn nêbeno. Eke çiyê qanûn de çînebî, yanî estbiyene kurdan ke qanûn de çînebiye, hiqûqê Tirkiye de jî çîno. Yanê hiqûqê Tirkiye de kurdî çîne. 3-Eke çiyê çînebî amê qebûlkerdene, mordem nêşikîno bêhete û hiqûqbiyene ra qese bikero. 4-Teyna remnayena A. Öcalanî û İmralî de îzolekerdena dê, bêhiqûqiya Tirkiye zaf eşkera ara re meydan. 5-Dadgehe DGM yê Enqere A. Öcalanî nêşikîno İmralî de mahkûm bikero. Angorê qanûnanê Tirkiye jî nêbeno. 6-Azadiya parêzeran çîna. Na jî angorê qanûnan jî şaş a.

Ma ke hênî ro ma se bikeme?

Ma ganî xo meparêznîme. Ma ganî êrîşê avakerden, sistem û biyena TC ye; êrîşê îşgal û îlhaqkerdena Kurdistanî; kîştina kurdan, ermenan, rûman, asûriyan, hirîstîyanan, êzdiyan, aleviyan û çepan bikerîme. Dîroke ra yanî Selçûkiyan ra hetanî Osmanîyan; Osmanîyan ra hetanî İttîhat Terakiye 1912 de yî, Lecê Dinya ya Yewîne, komkîştina nê deman, darbeya cumhuriyetî, reformê diktatoriye, tîkîliyê ebi împeryalistan ra û taybetî jî nazîyan û siyonîstan ra ganî masa ser ro bêrê rafîştene. Kurdî ganî xo meparêznê la belê êrîş bikerê. Ebi zanayene, ebi normanê insanetiye.

Sûcê dewleta tirkî: Sûcê leci; sûcêke hemverê insanetiye amêye kerdene û jenosîd ê. Na derheq mahkemeyê Leipzigî, Nunbergî, hetanî Divanî Harbî û xo parêznayena Fidel Kastro û N. Mandelayî, beratkerdena xorte armenîyano ke Enver Berlîn de kîşt, ganî pêro rind rêyna bêrê re ziwan. Na derheq de zanayena ma, tecrûbê ma zaf ê. Û ma dawaya xo de neheq nimê. Naye rê jî, ganî sere ra nêmeşrubiyena dadgehe Tirkiye bêro re ziwan, dîroke ebi nê argûmentan û erîşan bêro nivîsnayene.

Naye re jî ma rê hîrê çî lazîm ê: Xoverdayena birêz Öcalanî, Parêznayena Abûkatan, wayîr veciyena kurdan û şaranê bînan.

Zarokên Şer

Zarokên Şer çiroka serpêhatiyeke pîrozkirina Newrozê ye. Wekî em hemû dizanin, Newroz an Nû-roj tê maneya roja nû. Newroz li nav gelên Rojhilata Navîn tê pîrozkirin. Maneya Newrozê ji bo kurdan jî li hemberî zilmê serfirakirin e.

Wekî hûn dizanin di Newrozê de li kuçe û kolanan li qadan agir tê dadan, lastîk û teker tîn şewitandin û dîlan tîn girtin û stranên serkeftinê tîn gotin. An jî saziyên serdestan û cihên ku serdest bindestan ji çand û dîroka wan dişon, tîn şewitandin. Ka em binêrin Newroza çar hevalên hev, Şiyar, Mazlûm, Biro û Emer çawa derbas dibe...

Şiyar wê rojê bi heyecan û coşeke mezin şiyar bû. Vê gavê rûyê xwe şûst, çekên xwe yê pak li xwe kir. Hema taştê xwar û rahişte sandoqa xwe û derket derve. Rasterê wî û hevalên xwe hev û din dîtin û dest bi kar kirin.

Brahîm, Mazlûm, Emer û Şiyar dîsa bi hev re ne. Ji ber ku 21'ê Adarê Newroz nêzîk dibû, ji bo amadekariyên pîrozkirin wê li hev civiyabûn. Emer got; "herî baş em roja Newrozê çar hevalên xwe yê din jî hildin û lastîkên erebeyan bişewitînin û li dorê jî dîlanê bigirin."

Brahîm ket navê û got: "Li gorî min ev çalakiyeke biçûk e. Gerek em çalakiyeke mezintir pêk bînin. Ez dibistanekê zanim em şeva Newroê dikarin wê bişewitînin. Hem wê agirê wê mezintir be. Wê her kes jî fam bike ku ji bo Newrozê hatiye şewitandin." Şiyar jî dibêje; herî baş em a Biro bikin û wiha berdewam dike: "Gerek em bi vê tenê jî nesekin. Ji ber ku Serok Apo 21-28'ê Adarê wekî 'Hefteya Lehengiyê' îlan kiriye. Ji ber vê sedemê di nava vê hefteyê de jî em herroj çalakiyan li dar bixin." Belê ma wê her



kes fikrên xwe bîne zimên, wê Mazlûm bêdeng bisekine? Wî jî wiha got: "Li jora mala me li kolanekê her şev erebeyeke PTT'ê disekine. Em karin di Hefteya Lehengiyê de wê jî bişewitînin."

Ev her çar can hevalên hev, wê êvara Newrozê dibistana seretayî bişewitandana. Wê Emer benzîn bianiya, Mazlûm nobedarî, bikira herî du yê din jî dibistan bişewitandana.

Wan bi pereyên ku roja Newrozê bi dest xisitîbûn, galonek benzîn standin, êvarî li

hev civiyên û plana çalakiyê çêkirin. Dêdora dibistanê baş qontrol kirin. Li derdorê tu kes nedîtîbûn lê bi beqçiyê li pişt dibistanê nehesiyabûn.

Wê Mazlûm li deverê li pişt dibistanê xwe veşarta, ku tiştê bibûya wê sê caran bikwîtanda. Her tiştê tamam bû.

Mazlûm cihê xwe girt û sê hevalên wî yê din jî di şibakeyên dibistanê re ketin hundir û benzîn rijandin her derê. Gava derketin jî, bi derbikê agir berdanê.

Gava ku di camê re derketin û xwe di ser dîwêr re

avêtin, Şiyar ji aliyê beqçiyê dibistanê ve hate zeptkirin.

Belê hevalên wî gotin "em nikarin Şiyar bihêlin û birevin."

Diviyabû ew xilas bikirana. Rahîştin kevîran û êrîşî beqçî kirin.

Hema bêje beqçî dan ber barana kevîran.

Beqçî ji bo xwe xelas bike, reviyabû û Şiyar jî xilas bûbû.

Gava ku bi şid ji wir veqetiyan û li paş xwe nêrin, ji dibistanê agir û dûxana reş ilor dibû.

Piştî demeke dirêj, ji Weşanên Aram pirtûkeke lêkolîn-lêgerînî Piştî Împaratoriya Med Kurd

Di pirtûkê de ji serdema Împaratoriya Medan heta li Kurdistanê bicihbûna Osmanîyan, dîroka kurdan hatiye pêşkêşkirin. Ji bilî vê pirtûkê, bi zimanê tirkî 5, bi zimanê kurdî jî 8 pirtûkên Torî hatine weşandin.

Pirtûka dîrokzanê û nivîskarê kurd Apê Torî ya bi navê "Med Împaratorluğundan Sonrasında Kürtler (Piştî împaratoriya Medan Kurd)" ji nav Weşanên Aramê derket.

Nivîskarê pirtûkê Torî, di pirtûkê de ji heyama avabûn û pelişîna Împaratoriya Medan heta bicihbûna Împaratoriya Osmanîyan hildaye dest. Her wiha ji bilî Împaratoriya Osmanîyan dîroka hozên turkmenan, Împaratoriya Sefewîyan û hukumdariya wan vegotîye. Torî, wekî din di pirtûkê de bi awayekî hûrbînî li ser herêm, erdnîgarî û hozên (boylar) kurdan ên wê demê jî radiweste, herêman û hozan dide naskirin, dîsa, bi awayekî hûrbînî erdnîgarî û gel hatiye nasandin û dîroka wan hatiye pêşkêşkirin. Wekî mînak: Serdema Medan, di bin sernavên a) Erdnîgarî. b) Gel c) Dîroka de radixe ber çavan.

Wekî din çend belgeyên erdnîgarî û nameyên ku di nava hozên osmanî û safewîyan de hatine nivîsîn, hatine derpêşkirin.

Mirov dikare bi awayekî giştî mijarên ku pirtûk di hundurê de bi van ser-

navan bide: 1-Herêm û hozên kurdan. 2-Yezdan Kardamumias ku navê xwe daye kurdan. 3-Rewşa Împaratoriya Med a piştî felîşînê. 4-Berî kukurd we-rin Anatoliyê, herêmên din ên ku kurd lê dijîyan û eşîrên kurdan. 5-Serdestiya Selçûqîyan a li ser herêmên kurdan. 6-Tirkmen û kirinên wan ên li welatê kurdan. 7-Hozên tirkmenan ên ku li herêmên kurdan hatine bicihkirin. 8-Serdestiya Sultan Selahaddîn û Dewleta Eyyûbî ya li ser welatê kurdan. 9-Dagirkirina herêmên kurdan ji aliyê moxolan ve.

10-Dagirkirina (istila) herêmên kurdan ji aliyê Timurê Leng ve.

11-Ketina binê rêveberina Osmanîyan

12-Astengiyên li ber ji eşîretiyê derbasî rêveberiyê dewletê bûyîn.

Pirtûka "Piştî Împaratoriya Med Kurd" ku bi temamî bi zimanê tirkî ye, bi giştî ji 384 rûpelî pêk tê.

Ev lêkolîna Nivîskar Torî, balkêş e û lazim e di arşîva her kurdî de cih bigire. Wî di amadekarina vê pirtûkê de, ji 63 çavkaniyan sûd wergirtiye. Torî di


pêşgotina pirtûkê de diyar kiriye ku di berhevkirina van agahî û belgeyan de, ji qîza xwe gelek alîkarî girtiye û spasîyên xwe pêşkêşî wê kirine.

Ji bilî vê pirtûka lêkolînî, bi zimanê tirkî 5, bi zimanê kurdî jî 8 pirtûkên Torî li ser mijarên cur bi cur hatine weşandin.

Pirtûkên wî yên bi kurdî ev in: Qolinc: (Çîrok), Şilan (Çîrok), Koçber (Çîrok), Elfabeya Kurdî, Destpêka xwendin û nivîsandina kurdî, Ferheng, Siltan Silahaddîn û Malbata Eyyûbî, Rêziman.

Mirov dikare li ser weşanxaneyê ku ev pirtûk weşandiye jî van agahiyan bide:

Weşanên Aram ku ev demeke dirêj e vebûye, heya niha ji bilî vê pirtûkê, neh pirtûk weşandine. Ev pirtûkên ku heta niha çap bûne, bi cure-nivîsên têvel in, wekî lêkolîn, bîranîn, roman, ceribandî û helbest û hwd.



Weşanên Aram ji bo rojên pêşiyê amadekariya du pirtûkan dike. Ev her du berhem jî yên Umur Hozatlı ne, berhe-ma yekemîn ceribandina bi "Nivîsên Medyayî" ya din jî pirtûka helbestan e û navê wê jî 'Hemû aliyên dilê min' e.

Li gorî agahiyên ku me ji berpîrsên weşanxaneyê navborî wergirtine, ji bilî pirtûkekê, hemû pirtûkên ku ji hêla wan ve hatine derxistin, hatine berhev-kirin.

SERWÎSA ÇANDÊ

Qêrîneke bêdeng Helebçe

Di dîroka gelê kurd de, roja 16'ê Adara 1988'an de mirinê rûyê xwe yê qeş, di her çar parçeyên Kurdistanê de nişan daye. Li bajarê Helebçeyê li ber çavên hemû cihanê, şeş hezar kurd; piraniya wan jin û zarok, bi çekên kîmyewî hatin qirkirin. Ev qetlîam û jenosîda li hemberî gelê kurd îro bi kompoyên navneteweyî bi berfirehî berdewam dike lê êdî gelê kurd ne kurdên berê ne. Îro gelê kurd li her derê cihanê bi agirê bedena xwe, van kompoyan, jenosîdan şermezar dike. Yanzdeh sal berî niha li ber çavên hemû cihanê, nêzikî şeş hezar kurd giraniya wan jin û zarok ji aliyê Sedamê faşîst ve bi gazên kîmyewî hatin qirkirin. Têkoşîna gelê kurd a ku ji bona di nava malbatên cihanê yên birûmet de cihê xwe bigire, ev daxwaza mirovahiyê ji aliyê împeryalîstan ve nehate dîtî.

Gelê kurd ê ku welatê wî bi awayê cografî bûyî çar parçe, li her parçeyî, li hemberî her êrîş û tevkujiyên dagirkeran rû bi rû mane. Dagirkerên ku welatê kurdan di nava xwe de parçe kirine. Her çiqas di navbera wan de nakokiyên berjewendî hebin jî, li ser gelê kurd, di navbera wan da tu nakokî namîne. Ev yek ji bo DYA û welatên Ewrûpî jî wisa ye, jixwe gazên ku li Helebçeyê hatibûn bikaranîn, bi hevkarîya wan welatan ketibû destê Sedam.

Sala 1988'an de konjektura ramyarî ya Rojhilata



Navîn, li aliyê rejîma Sedam bû. Wê demê Xumeynî li Îranê Rejîma Şah wergerandibû, Şahê alîgirî DYA'yê dema têk diçe, tîrsa Xumeynî dikeve dilê DYA û Ewrûpayê. Ji bo vê yekê, welatên împeryalîst piştgirî didane Sedam.

Dîrokê careke din xwe dubare dikir. Wekî tê zanîn berî Tevkujiya Helebçeyê jî bi peymana di navbera Sovyetên Yekbûyî û împeryalîstan ve Komara Mehabadê ji aliyê dewleta Îranê ve hatibû hilweşandin. Gelê kurd careke din ji pamanên navneteweyî re bibû qurbanî.

Belê di bingeha van qetlîaman de, parçekirina welêt heye. Ji ber ku gelê kurd di navbera xwe de yekîtiyeke neteweyî çênakirîye û nakokiyên di navbera dagirkeran de baş nedîtiye û li gorî berjewendiyên xwe pêk neaniye, têk çûye. Ev yek di dîroka gelê kurd de rastiyeke e. Lê mixabin welatên dagirker û împeryalîst hê îro jî naxwazin têkoşîna gelê kurd a mafdar bibînin. Li hemberî vê yekê bi durûtîyeke mezin bi senaryoyên nû ji bo qetlîam û jenosîda gelê kurd li pey kompoyên nû digirin.

Lê belê gelê kurd îro ne kurdên berê ne. Li başûr û bakur, rojhilat û rajava dil kirine yek. Li pey nîrxên neteweyî tev li dora rêberê xwe bûne topek ji êgir û wê mesajê didine cihanê: "Em êdî nahêlin ku hûn Helebçeyên nû çêkin, em êdî nahêlin hûn bedena welatê me bidin ber xençera." Ji bo vê yekê jî mînaka herî baş li hemberî kompoyê navneteweyî ji Silêmaniyê bigire heta Amedê, ji Qamişlo heya Urmiyeyê û dîsa li her deverê cihanê ev bersiv hate dayîn.

Qêrîna gelê kurd a bêdeng, îro bûye serhildana bi milyonan, bi van serhildanan gelê kurd wê cihê xwe bigire. Tu hêz nikare gelê kurd ji wê daxwaza mafdar bi dîr bixe. Wekî li her derê cihanê û Kurdistanê li metropolên Tirkîyeyê jî, gelê kurd şehîdên Helebçê bi bîr anîn û careke din dijîmîne mirovahiyê şermezar kir.

A. POYRAZ-D.ÖZALP /İZMİR

Nûçeyeke kuçeya nîgaşî

Ji Navenda Nûçeyên Nîgaşî (NNN) nûçeyeke balkêş li ser hîlbijartina Tirkîyeyê gihîştê ber destê me. Em vê nûçeya ku bi mahreça kuçeyên nîgaşî yê Stenbolê û bi şanênavê Bêdeng Dêbibe hatiye weşandin, bêşîro-ve derpêş dikin.

NNN/16.03.1999 nîgaşî/ Bêdeng Dêbibe

Di vê germa zivistanê de ku li aliyekî berf û bahoz, li aliyekî agir û pêt dibare, tevî hemû hewlên xeydokan û sofikan ên ji bo taloqkirina hîlbijartinên, xebatên hîlbijartinê yê Partiyên Pergala Kemalî lez girt. Ji Edîrûnê heta Xarpêtê, ji Mêrsînê heta Trabîzonê Serokên partiyên welatperwer xwepêşandan û mîtingan pêk tînin. Hunermendên navno û mast bi to ji çavkeriyên xwe di reşnameyan de dinivîsin. Li vê derê mijara me ne çavkeriyên wan e.


Em dixwazin bala we def bidin (bi devokî lex bikin) aliyekî din; panoyên bele-diyyan ên ku jê re billboard tê gotin, bi dirûşm û wêneyên Partiyên Pergalê hatine xemilandin.

Em dixwazin çend mînakên bidin:

Ji bangeşana Zeyneba Zer

Hemxetî: Zeyneb Xanim zarokên min çênabin.

ZZ: Çare heye! An dê çêbe, an dê



çêbe.

Hemxetiyêke din: Zeyneb Xanim!

ZZ: Bêje qurban, eta we bi qurbana we be. Hûn dayikên şehîd û xaziyan in. Ku ne ji we bûya niha tiştêkî min tunebû, ez dê wekî profesoreke reben û nezan li ber dîwaran bimama, îro spas ji god re, ez li Hespa Spî siwar im û her tiştê min heye. Ez li nik Qersa Spî ji xwe re ji ke-

virên Qesra Qanco û Bircên Amedê bi xwîna mihemedokên xwe qesrekê lê dikim. Monica nikare navbera min û Bill xera bike.

Heman hemxetî: Zeynep Xanim kurê min ji leşkeriyê nehat, ez çi bikim?

ZZ: Çare heye! Yan dê were, yan dê were.

Hemxetiyekî dîtir: Zeynep Xanim,

zarokên min ji nêz de mirin.

ZZ: Çare heye! Yan dê ji gorê rabin, yan dê ji gorê rabin.

Ji propagadaya Bextiyar Gencî çend mînak:

Guhên min gelekî baş dibihîzin, ez dengên ku guhên mirovan nabihîzin jî, dibihîzin. Dengê nîzim û nîzimkaran gelekî xweş tê guhên min. Lê dengê kesên teşqeekar nayê guhên min. Ji vî alî ve ez gelekî dişibim Guhdîrêjê Ker. Wî jî dengên ku li berjewendiyên wî nedihatîn, nedibihîstîn. Ji bo kesên ji piraniya debeng biborin bêdeng (PB) û hindikahiya teşkîlatdar (HT) li min negirin, min dixwest bibêjim teşqeekar çend nimûne:

- Bextiyar Beg em birçî ne (HT)
- Bextiyar Beg mêrê min ji kar hate avêtin! (HT)

- Bextiyar Beg em çîma Apo darve nakin (PB)

- Bextiyar Beg em aştîyê dixwazin (HT)

- Bextiyar Beg em kê bikujin? (PB)

- Bextiyar Beg ev şer dê kengî biqede? (HT)

- Bijî Serok Apo! (PKK)

- Apo bidin me, em parçe parçe bikin. (PB)

HINYDIKAHÎ TEŞQEELKAR

BI XELAT... XAÇEPIRSA BI XELAT (164) XAÇEPIRSA


Mêlûnê Mêlûnê Mêlûnê	10	11	12	13	14	15	16	17	18	19	20
A	B	V	A	N	S	Î	N	E	M		
H	A	D	E	P	M	A	L	Î			
M	A	N	M	E	L	E	V	A	N		
N	B	A	S	A	N	L	A				
A	B	Â	R	T	L	D	Î	K			
O	S	W	E	K							
A	G	A	G	O	R						
A	N	Î	N	T	E						
A	N	R	Û	P	Û	S					

Bersiva Xaçepirsa 162'yan

Xaçepirsa me bi xelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigihêjin ber destê me, em dê wan binirxînin û bi riya peşkê li 5 kesên belav bikin. Xelata hejmarê me ya 164'an e. pirtûka Memet Mamas Dağlarında Öldür beni ye.


Jêrenot:

Ji bo ku bersiva we bê nîrxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî navnîşana xwe ji me re bişînin.



Bi soranî Mezin Şehîdeke Newrozê	Qertafek Xebatkar	Çeqmaq Bi kirdkî erê	Paşguh Xwedênen as	Tevgera hewayê Dengdarê n Kon	Bi devokî zinar
Cinavkek Alavên şewitand- inê	3	War, qad Gihaneke k		1	Bi soranî Ev
		Digel hev Gelo	2	Cinavkek Polisên naziyan	6
qertafek Sembola Hidrojenê		Cinavkek Wargehê havinê	Niavekî jînan Navê Bêritanê		
Endam Bawerî			Tîpa yekemîn Paşgîrek	Dijwateya bin Dijwateyê birinê	
Evro kurtnivîsa kilometre		5	Reng, cefa Berepaşkî fêkiyek		
	Dengê bil- imê gur Noteyek		4		
Felaket Bi kirdî van			Notayek		
			Rêxistina nivîskaran		

PEYVA VEŞARÎ



Pênc kesên xelata hejmarê 162'yan, pirtûka Siyahpuş "Çand xezel û helbest" qezenc kirine: Recep Minas/ Meletî, Maşuk Güler/ Semsûr, Süleyman Açıy /Midyad, Ali İmren /Enqere, Yüksel Aslan /Stenbol

ÎMRALÎ RA XEBER ESTA

Rewş rind o xoverdayîno rameno

MEMED DREWŞ

Tirkiye ardîne Serokê Giştî yê PKK Abdullah Öcalanî peyra kamê ma vînenê rewşê Öcalanî pers kenê û wazenê derheqê rewşê Öcalanî de wayirê zanayin bê. Heta ma yê rastê kamî yemî iyê vanê ke; Tirkiye ardîne Öcalanî peyra mayê qaxûyê reşwê Öcalanî ya rakewmî û ê qaxûya werzemi. Rastî jî winî yo. 15'ê menga reşemiya na kişt, jew şarê kurd teniya nê, hemû şarê bindest û dostê şarê kurdê rewşê Öcalaniya rakewnê û rewşê eya werzenê. Coka ma rewşê Öcalanî yê peyinî ser ro abûkatanê ci ra qisey kerd. Niwa tepiya jî çend ma dest ra bêro ma yê na rîpel de rewşê Öcalanî ser ro vindim û şima wayirê zanayin bikim.

Abûkatê Serokê PKK Abdullah Öcalanî, Ahmet Zeki Okçuoğlu 11'ê meng de şî "Girawê Îmralî" û Öcalaniya 45 deqê pêdiyin viraşt. Rojê didin jî ma şîm Okçuoğlu het û derheqê rewşê Öcalanî de eya pêdiyin viraşt. Bi rastî nê pêdiyinî de riwê Okçuoğlu wiyayê. Tabî ma hema riwê eyra ma fahm kerd ke, rewşê Öcalanî rind o. Hewna ma mesel nêakerdîbî ke Okçuoğlu hema pêdiyino verîn û peyin ard pêver û vat: "Goreyê verî na fin rind bi. Hem hakîm çinêbî û hem jî ê mardimê rîmaskeyin çinêbî. Tenya jêwerî di metrey dîrî ra ma goşdarîn kerdîmî. Pêdiyin na fin 45 deqey ramit. Moralê Öcalan bi xo jî zaf zaf rind o."

Okçuoğlu persa ma ya "Moralê Öcalanî senîn (çitor) bi" de wina vat: "Fina verîn de moralê ci, qe rind nêbî û qe nêewnayê mi ra. Coka ez o çax fikiryaya ke înan darî dayo Öcalanî. Feqet Öcalan na fin winî nêbî. Verniya pêdiyin ra hetanî peynî moralê ci rind bi, wext wext wiyayê, wext wext ewnayê çimandê mi miyan. Öcalano xo rojê mehkama rê keno hedre û oyo, rojê mehkama de 75 seranê dewleta tirk biyaro rojev. Serdarê dewlet çend şenê, wa vajê: 'Na mehkama, ê kurdan niya, mehkemaya Öcalanî tenya ya'. Mehkema ya bibo mehkemaya siyasi û platformê mesela kurd. Xora Öcalan xo jî na noxte ser ro vindart û oyo pawitina (parastina) xo jî estin û haqanê şarê kurd ser ro virazo. Ma yê xo nika ra kemi hêdîre. Ma abûkatê pawitîne xo nezdiyê di hezarî rîper hedre bikim. Ancî ma yê fikr û vînanê hiqûqzanayanê dinyay jî bigim. Coka mehkemaya Öcalanî ya winî bibo jû mehkema ke, şarê dinyayo bibo

MEM KAYA

BÊJING



juryyê na mehkema. Lazim o ke her kes na mehkema wina bihesibno. Yanê wa kes mevajo mehkemaya Öcalaniya Girawê Îmralî de û mabenê çehar dêsan de viraziyo. Ewro hinî kurdana piya çimê her kesiyê "Girawê Îmralî" ser ro. Her roj her kiştê dinyay ra bi seyana televizyon, radyoy û rojnemeyê min geyrenê û wazenê rewşê Öcalanî ser mi na qisey bikirê. Coka ma yê na mehkema zey çehar dêsan miyan de nêvînem. Ez şena nay jî nika ra vajî ke, ma na mehkema ewro ra qezenc kerda".

Abûkatê Öcalanî, cayê mendin ser jî vat ke, Öcalano rewşê mendinê cay ser ro nêvîndeno. Oyo peyniya qezencanê, na mesele ser ro vindeno. Ze ke yeno zanayin Öcalan wexto ke hewna Ewropa de bi raya telefoniya tewrê jew programê MED-TV bibi û vatibi: "Ez ceznimî bindîbî jî ezo qandê azadiya şarê kurd bixeftiyî". Bi rastî wexto ke abûkatî na vatena Öcalanî ardê zîwan, a seat vatena Öcalanî ya corîn amê mi vîrî û ez wina fikiryaya. Girawê ke qandê şaranê bînan cayê tatil û arasayin ê, qandê ma cayê winayinê jî benê ceznim. Öcalano nika Girawê Îmralî de xover dano, şarê kurdo jî her kiştê dinyay de. Hetanî çimhal? Bêguman hetanî pêdiyinê Amedî.

Sebebê şîdetî kurdî niyê?

Nê rojanê peynan de, nameyê "Tîmê Heyfgirotinê Neteweperwerên Kurd" de jû tîm niyaya ro (awan biya). Na tîm çend cay bombe kerdî û çend cay jî veşinay. Peyniya cayê sivilan rê vardayin viraştin de xeylê sivilî mardî. Goreyê vatenanê serdarên na tîm, iyê niwa tepiya vardayanê winayinê viraştin dewam bikirê. Iyê vera her dewa kurdan veşnayin de, jû dew yan jî semtê tirkan biveşnê. Vera her kiştinê kurdî de jew kemalist bikişê.

Kerdenanê na tîm êkê hetanî nika vengê xo nêvet, nika vejîyayê werte û iyê qîrayina wazenê ke şîdet vindiro. Şîdeta teva çareser nêbeno. Wexto ke kes ewneno nê vatenana, vano qayê kurdê bêşîdet teva nêzanê. Hetanî vizêr goş û çimê xo racenaybî teva nêdiyê nika vejîyayê wazenê ke wa şîdet mevira-ziyo.

Amey kurdî, helikopter ra çekerdî veng nêvejiya. Cenîyanê kurdan rê tecawuz viraziya veng nêvejiya. Güçlûkonak de 11 sivilî kişiyay nêdî. Gerîlay weş weş tepîştî kiştî, nînan veng nêvet. Çehar hezarî dewî werte ra hewadiyay nêdî.

Nê ker û korê ke ewro qîrenê û wazenê ke şîdet hewadiyo, jew şîdeto ke Metropolan de viraziyo ey wazenê û ey protesto kenê. Feqet qetîfama ke 11'ê meng de sûka Batmanî Sason de viraziya û 17 sivilî hetê Artêşa tirkana amey kiştin, viradê protesto kerdin iyê qe nêvînanîna yenê. Bado vejîyenê û vanê; şîdeta teva çareser nêbeno.

Ma kesî ra pers nêkena?. Sebebê nê şîdetî şarê kurdo?. Yan jî dewleta tirkî?. Hetanî nika kambi hirê finî, adirbirnayin îlan kerd û timûtim vat bêrê ma nê şerî raya demokrasi û siyasiya çareser bikim. Şîdetî viradê, şîdeta teva çareser nêbeno. Feqet dewlet timûtim şîdeta amê şarê kurd ser. Timûtim vajiyeno kam çi-çî bikaro ey çineno. Xale bikarê xale, cew bikarê cew. Qe cayê jî nêvînyayo jêwerî xale karito û cew çinayo. Dewlet şîdet karit û aya nika şîdet çinena.

Raya nê şîdetî vindartin çiniya. Bêguman esta. Feqet na ray kurdan dest de niya. Na ray dewlet dest de na. Eke dewlet biwazo na ray şena di seatan miyan de akiro û peyniya şîdetî biyaro. Tabî eke biwazo.

WELAT
ROJNAMEYA HEFTEYÎ
(Haftalık Gazete)

■ Xwedî (İmtiyaz Sahibi)
M. NURİ KARAKOYUN
■ Yönetim Yeri:
İstiklal cad. Asmalı Mescit sok. 35/37 No:308
Beyoğlu/İstanbul
TEL: (0 212)

245 16 50 - 251 79 37 - 251 90 13
FAX: 251 95 85
■ Gerîndeyê Giştî yê Weşanê
(Genel Yayın Yönetmeni)
SAMİ TAN
■ Berpirsê Karên Nivîsaran
(Yazı İşleri Müdürü)
M. SALİH TAŞKESEN
■ ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.
■ Yayın Koordinasyon:
Gündem Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti.

■ BELAVKIRIN
BİRYAY Dağıtım
■ NİVİSGEHEN TÊKİLİYÊ
(İrtibat büroları)
■ Amed:
Tel: 0 (412) 223 34 83
■ Mersin
Tel: 0 (324) 233 83 96
■ İzmir
Tel-fax: 0 (232) 425 37 02
■ Edene
Tel: 0 (322) 351 42 78

■ (Nûnerê Giştî yê Ewrûpayê)
Mahmut Gergerli
Tel: 49 871 672 29
Fax: 49 871 670 815
■ Swisre:
İhsan Kurt
Tel-fax
41 21 652 76 07
■ Fransa:
M. Ali Doğan
Tel- 33 614 32 43 55

■ Belçika
I. Can
Tel: 32 53 64 12 41
■ Hollanda:
S. A. Fewzi
Tel-Fax: 31 10 48 555 43
■ Almanya:
Fener Rojbiyanî
Tel: 49 228 92 51 284
■ Suriye:
Jana Seyda
Helim Yüsiç

Xweşûştina bi êgir



NÎro Dehaqên "nûjen" ne kêmi yên berê ne. Tenê zimanê wan cuda ye. Lê Kawayê Hesinkar carekê tov reşandiye li ser axa Kurdistanê. Ew tov li hemberî her çar Dehaqên nûjen bûye artêşa gelên Mezopotamyayê.

Newroz di serî de ji bo gelê kurd û gelên Rojhilata Navîn tê gelek wateyan. Mirov dikare van wateyan wiha rêz bike; nûroj(roja nû), dawiya rojên tarî û sar, azadî, hatina biharê û hwd.

Di gelek berhemên kevn de Newroz cih digire. Derheqê Newrozê de gelek dîtinên cuda peyda bûne. Lê divê mirov balê bikişîne ser destanan. Destan berhemên gelêrî ne, ji aliyê gel ve carinan tene dirêjkin, kurtkin, tiştên xeyalî lê tene zêdekin. Ev zêdetir jî girêdayî rewşa gelan a sosyo-polîtîk e.

Pêşî Newroz di pirtûka pîroz a Zerdeştîyê; Zend Avestaya ku berî Îsa hatiye nivîsandin de, cih digire. Bi dû wê re di pirtûka Fîrdewîsî ya navdar Şehnameyê de derbas dibe. Fîrdewîsî di Şehnameyê de balê dikişîne li ser Dîrefşa Kawa. Li gorî Şehnameyê di dema ku Kawa û Ferîdûn diajon ser qonaxa Dehaq de di destê Kawa de Dîrefşek (ji çerm çêbûye) hebûye û li ser dîrefşê sê reng hebûne; kesk-sor zer...

Newroz di helbestên Melayê Cizîrî, Mem û Zîna Ehmedê Xanî de cih digire; di Şerefnameya Şerefxanê Bedlîsî û gelek pirtûkên dîrokê de wekî cejneke neteweyî, çanda kurdan derbas dibe. Kurd û gelên heremê bi sedan sal in Newrozê wekî cejneke neteweyî û çandî pîroz dikin.

Li gorî destanê, di bin pêşengiya Kawa de şervanên medî, îskît, babil bi artêşeke hevgirtî kela zilmê Ninovayê û despotiya Dehaq hildiweşînin. Marên di sînga Dehaq de derketibûn û zarokên ku bo mejiyên wan li birîna xwe bide ji aliyê Dehaq ve di-

hatin kuştin hêla destanê ya mîtolojîk e.

Sê hezar sal Kurdistan bû warê gelek dagirkeran, gelek hovên dîrokî tê re derbas bûn û bi vê re Newroz jî hêdî hêdî bû cejneke kevneşopî û hate xwestin ku ji ruhê xwe yê neteweyî bê dûrxistin. Tenê li Îranê bi awayekî fermî kurd cejna xwe pîroz dikin. Li Başûrê Biçûk di bin astengiyên gelek mezin de li derviyî bajarên Kurdistanê dihate pîrozkin.

Kurdan di roja 21'ê adarê de kincên xwe yên paqij û qeşeng li xwe dikirin û amadekariya xwe ji bo şahiyê dikir û derdiketin meydanan. Îro jî ev yek xurtir didome. Agirê ku li meydanan vêdikeve xweşûştina kurdan a ji qirêjiya dagirkerî û koledariyê ye. Di fikr û ramanên de pelçiqandina sînoran e.

Îro Dehaqên "nûjen" ne kêmi yên berê ne. Tenê zimanê wan cuda ye; erebî û tirkî... Lê Kawayê Hesinkar carekê tov reşandiye li ser axa Kurdistanê. Ew tov li hemberî her çar Dehaqên nûjen bûye artêşa gelên Mezopotamyayê.

21'ê Adara 1982'yan bûbû mîlada Newrozê ya duyemîn. Di vê dîrokê de Kawayê Hesinkar li Zindana Amedê xuya bûbû. Belkî ne ew bi xwe bû lê neviyê wî bû. Mîlada Newrozê ya duyemîn bi Mazlûm Doğan re dest pê kiribû. Newroz êdî sê derbik bû, jiyaneke nû û domdar bû. Piştî vê , ruhê Newrozê yê berxwedêr li çar aliyên Kurdistanê belav bû. Ronahî, Rehşan, Bêrîvan, Sema, li Başûrê Biçûk Salih Mihe-med, nozdeh şehîdên Rojhilat û bi hezaran lehengên bênav...

EMÎN BOZAN

Têbiniyên ji Amedê

RÊNAS KAYA

Yek ji rojên pîroz ên kurdan Newroz wê di dawiya vê hefteyê de di serî de li Kurdistanê, Tirkîyeyê, Rojhilata Navîn û çarmedora cîhanê ji aliyê kurdan ve bê pîrozkin. Biçûk mezin hemû kurdan îsal zûtir dest bi amadehiyên Newrozê kiriye. Sedema wê jî bi çûna Îtalyayê ya Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan re destpêkirina pêvajoya dîrokî ye.*Ji 12'yê sermaweza 1998'an vir de kurdan, çalakiyên têvel li dar xistin. Pêla serhildanên nû hîn jî didome.

Bi anîna Abdullah Öcalan a Tirkîyeyê re çalakî derketin asta herî bilind. Bi çalakiyên ku li Kurdistanê ji berbangê hetanî derengiya şevê didomin re dewlet kete tirs û sawa Newrozê. Lewre jî îsal jî qedexeyan dest pê kir, bi taybetî jî li Amedê. Li ser rûdanan Waliyê OHAL'ê Aydın Aslan got, "Ji mirov tirî serhildan dê pêk bê", her wiha Waliyê Bajêr Nafîz Kayalî qala pîrozkirina fermî dike. Ji hingî ku Kayalî hatiye Amedê vir de di navbera wî û Waliyê OHAL'ê de pevçûn heye lê dema kurd tene rojevê ev yek jî holê radibe. Bi nêzîkbûna Newrozê re Kayalî li dû hev bi waliyê OHAL'ê re axivî, bi navê girtina "tevdir"an hin rêzebiryar girtin.

Waliyên ku gir û hêrsa gelê Amedê kişandin ser xwe, ketina herêma OHAL'ê ya çapemeniya biyanî qedexe kir. Li Amedê bi fermana emniyetê hemû polis hetanî dawiya adarê ketin alarmê. Li OHAL'ê maweya binçavkirinê 10 roj in lewre jî ji 12'ê adarê pê de opersyona binçavkirinê dest pê kiriye.

Li Amedê "vexwendnameya Nevrûz" e ya Rektoriya Zanîngeha Feratê tim û daîm di destê hêzên dewletê de ye. Zanîngeh dixwaze bi vexwendnameya ku bi rengên kesk, sor û zer xemilandiye naveroka Newrozê vala bike. Dewleta ku kûrdela kesk, sor û zer a li ser porê Leyla Zanayê wekî "al" bi nav kir û lempeyên trafîkê ji ber rengên wan hatin guherandin, niha jî vexwendnameya Zanîngeha Feratê ku wekî cih û warê faşîstan tê nasîn nîşanî her kesî dide û dibêje, "bi rengên kesk, sor û zer re arîşeya me tune."

Tiştê balkêştir ew e ku dewlet li Amedê bi ser malan de digire û kincên kesk û sor û zer diçirîne. Dema mirov li helwesta Waliyê Ohal'ê dinêre, dewlet dê ji bo ku Newroz li Amedê neyê pîrozkin îsal jî hewl bide.

Newroz li Amedê bicoştir e

Salên borî bo astengkirina pîrozkirina Newrozê gelekî hewl dan. Li gorî xwe gelê Amedê baş nas dikirin lewre jî ji wan tirê dê rê li ber bigirin. Lê belê rûdan ne li gorî daxwaza wan çûn serî. Amedê di her Newrozê de zarokeke bi navê Serhildan dianî dinyayê. Îsal jî bo vê xwe amade dike.

Amedê helwesta xwe bi çûna Îtalyayê Öcalan re da der. Tu rê tune, coşa Newrozê wê bajêr serdanpê rapêçîne. Li her mala Amedê amadehî bi lez û bez û bi dilgeşî didomin. Dayikên ku rûyê wan dişibe Kurdistanê, digel keçên xwe ji bo ku di Newrozê de li xwe bikin, dest bi dirûtina kincên neteweyî kirine. Generalên Biçûk ên Amedê jî mêj ve amade ne.

HADEP û rêxistinên demokratîk jî guh didin gotinên gel û dibêjin, "Newroz li Amedê bi coşî tê pîrozkin, gel vedixwînin Amedê." Amed bo hembêzkirina kesên ku dixwazin heman coşiyê bijîn amade ye... Lê hûn!?